Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 57
15'ê February
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## 3 Partiyên Din Yên Neteweyên Îranê Tevlî Kongireya Neteweyên Îrana Federel Bûn

Di civîna 27.01.2007'an ya Kongireya Neteweyên Îrana Federel de, 3 Partiyên ser bi neteweyên Îranê wekî endamên Kongreyê hatin wergirtinê ku 2 ji wan partî û saziyan Kurd bûn

**Nûçe di rûpela 4'an de**

# LI SER DAXWAZA PDK ÎRANÊ, GELÊ KURD LI KURDISTANA ÎRANÊ BÛ ENDAMÊ "UNPO"YÊ


2 Daxuyaniya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Derheq Pilînoma Nehem …

3 Nûneratî Di "UNPO"ê De



4 "UNPO" Dergehek Ji Bo Navneteweyîkirina Pirsa Kurd



7 Cudabûnên Nava Refên PDK Îranê, Sedem Û Encamên Wan!



Beşa 2

11 Gavek Din Ya Paşverû



14 GERDÛNÎBÛNA MIROV




**Di Destkevteke Din Ya Dîrokî De, li ser daxwaza PKD Îranê, gelê Kurd li Kurdistana Rojhilat weke Endamê Rêxistina Neteweyên Bênûner (UNPO) Hate Wergirtinê**

Daxwaza endambûna PDK Îranê di yekemîn civîna asayî ya Desteya Serokatiya vê Rêxistinê de ku di rojên 1 – 3'ê Şibata 2007'an de, li avahiya Parlemana Ewropayê li Birûkselê pêk hat, piştî nirxandineke kûr û berfireh hate pejirandin.

Ji bervara 4'ê Şibata 2007'an şûnve, PDK Îranê wekî yek ji endamên eslî yên "UNPO"yê û nûnerê gelê Kurd li Kurdistana Îranê tê naskirinê.

Bidestxistina vê destkevtê gaveke girîng ya navneteweyî û bidestxistiyeke dîrokî ji bo gelê Kurd li Kurdistana Rojhilat tê hesibandin.

Siyasetvanê Kurd, birêz **Ebdula Hicab** wekî nûnerê PDK Îranê û Kurdistana Rojhilat di civîna serokatiya "UNPO"yê de beşdar bûbû. Deqa axavtina Birêz Hicab li ser malpera me bixwînin...

Rapor, nivîsar û nûçeyên berfireh di vê derbarê de li ser malpera me û her wiha vê hejmara Agirî (57) de bixwînin....

## Kesayetiyê Navdar Yê Kurd, Profesor Şekroyê Xudo Wexera Dawiyê Kir

Di du Behînameyên cuda de, PDK Îranê û Rojnameya Agirî sersaxî dan neteweya Kurd û malbata nemir Şekroyê Mihoyê Xudo

Rûpela 10



**Dr. Xusro Ebdulayî, Berpirsiyarê Têkiliyên Navneteweyî Yên PDK Îranê di**



**Hevpeyvîna di R. 5 -6'an de**

## "PROGRAMA ETOMÎ YA REJÎMÊ, PİRSEK E KU AŞTİYA CÎHANÎ DİXE XETERÊ"

## Hevpeyvînek Li Ser Rewşa Ziman Û Edebiyata Kurdî, Bi Evdile Koçer Re



**Hevpeyvîna di R. 12-13'an de**

www.arsivakurdi.org

# Daxuyaniya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Derheq Birêveçûna Pilînoma Nehemîn Ya Komîteya Navendî

Ji bo agehdarbûna tev aliyekê em radigehînin ku Komîteya Navendî ya PDK Îranê, hilbijartiya Kongireya 13'ehem ya partiyê, seet 9:30'ê sibêdeya roja çarşem, 11'ê Rêbendana 1385'ê Rojî hevberî 31.01.2007'an, pilînoma xwe ya nehemîn bi beşdariya endamên Eslî, Cihgir û Şêwirdarên Komîteya Navendî lidar xist û piştî çar rojan karê berdewam, êvariya roja şemî, 03.02.2007'an, dawî bi karên xwe anî.

Pilînomê bi îlankirina deqîqeyekê bêdengî bo rêzgirtin ji canê paqij yê şehîdan û pejirandina destûra kar û bernameyên dema civînan dest pê kir.

Piştre hevalê xebatkar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ji aliyê Deftera Siyasî ve şîroveyek siyasî di derbarê rewşa herêmê, Îran û Kurdistanê û bûyerên girîng yên navbera du pilînomên heştemîn û nehemîn yên partiyê de, pêşkêşî beşdarên civînê kir. Di vê şîroveyê de bi awayekî taybetî li ser maytêkirinên Komara Îslamî ya Îranê di nava kar û barên welatan, nemaze Lubnan, Îraq û Felestînê de bal hatibû kişandin û haydana girûpên tundajo ji bo têkdana tenahî û bêewlekirina van cihane ku encama wê destavêtin û maytêkirinê, xelkê Lubnanê tevî xisareke zaf ya malî û ziyanek berçav ya canî berbirû kir û aliyên Felestînî li dijî hev rêxist û alozî û dijwarî di wê deverê de zêdetir û agirê şer di navbera wan de da geşkirin. Li Îraqê bi destavêtin û piştevanîkirin ji destek û taqimên tundajo û kiryarên têkderane û xirabkarane yên xwe bi awayeke berçav xurt kir û zêdetir da xuyakirin ku çi rejîmeke li dijî aştiyê, maka xirabkarî û şer çêkirinê ye. Lewra jî civaka cîhanî û welatên herêmê bêtir metirsiyên çavkanîgirtî ji naveroka wê rejîmê û siyaset û kiryara xirabkarane kirin û ber bi pêşgirtina siyaseteke hevbeş li dijî vê rejîmê gav avêtiye.

Siyaseta biîsrarbûna Komara Îslamî ya Îranê li ser zengînkirina Uraniyûmê û xwe parastin ji daxwazên civaka cîhanî ji bo dûrketina wê rejîmê li bidestxistina çekên Etomî, aqibet biryara 1737'an ya Konseya Ewlekariyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî jê ket ku hinek ceza ji bo Komara Îslamî ya Îranê ji xwe girtiye û renge bi domkirina siyaseta heya niha ya wê rejîmê di vê derheqê de, cezayên tundtir û gavên din yên civaka cîhanî jî di şûn de be û Îranê ber bi rewşeke aloz û nebaş û heya tevî çarenivîseke reştir rû bi rû bike.

Di şîroveya Polîtbîroyê de qala tundtirbûna liv û lebatên serberedayî û tepeserkarane ya rejîmê derheq hemû xelkê Îranê û nemaze neteweyên bindest yên welat û kuştin, girtin û zext û givaşxistin bo ser azadîxwazan hatibû kirinê. Her wiha bêzariya zêdetir û nerazîbûna berfireh ya xelkê hatibû destnîşankirin ku vê çendê jî Komara Îslamî ya Îranê di hundirê welat de bi rewşeke nû re berbirû kiriye. Bi vî awayî Komara Îslamî pitir kete ber zext û givaşa derveyî û derbarê kirîza rejîmê di asta civaka cîhanî û welatên herêmê de, yê ketiye rewşeke nebaştir û hem di hundirê welat de tevî nerazîbûna zêdetir ya xelkê berbirû bûye.

Di pareke din ya bernmeya karê pilînomê de, ji aliyê Komîsyona Siyasî – Nîzamî ve derheq cudabûna hejmareke ji Kadro û Pêşmergeyan û veqetandina refa xwe ji PDK Îranê raporek hate pêşkêşkirinê. Di vê raporê de qala hewl û xebatên rêberiya partiyê ji bo berlêgirtin ji vê cudabûnê û karê şanda diyarîkirî ji bo gotûbêjê bi armanca peydakirin rêyên çareserkirina pirsgirêkên hundirîn, sedemên vê veqetiyanê, helwest û gavên partiyê, piştî cudabûna vê girûpê û karê şanda aramkirina rewşê, helwest û liv û lebatên PDK Îranê li hember vê komê di pêşerojê de, helwesta rêxistinên siyasî li hember vê veqetiyanê û helwest û xuyakirina piştgiriya berfireh ya endam û alîgirên partiyê û piştevaniya civatên xelkê Kurdistanê bi hûrî ketin berbasê. Beşdarên pilînomê di vê beşê de jî bi awayekî çeleng beşdarî basa li ser tev aliyên vê pirsê bûn û serbarê nerehetbûn ji vê veqetiyanê û şermezarkirina wê, hatin ser vê baweriyê ku wê cudabûne ji ber sedemên siyasî nebûye.

Her wiha pilînomê li ser vê yekê tekez kir ku heke ev kome naveke din cuda ji navê Partiya Demokrat ya Kurdistanê, ji xwe re diyarî bikin, derfet û delîveya curek alîkariyê dê pêk were û îmkana hebûn di hevbendî yan komeleyeke berfirehtir pêk tê.

Di vê parê ji basên civînê de Komîteya Navendî ya PDK Îranê bi çavê rêz û hurmetê ve mêzeyî helwest û hewlên hêzên siyasî yên dost û dilsozên PDK Îranê, bi taybet du hêzên sereke ên Kurdistana Îraqê, PDK'ê û YNK'ê kir. Her wiha pilînomê spas û pêzanîna xwe ji bona piştgiriya germ û peyman nûkirina civatên xelkê Kurdistanê kir ku di vê rewşê de ji PDK Îranê re xwedî derketin. Pilînomê rêz ji helwesta jêhatî û nîşandana sozdariya dubare ya endam û alîgirên partiyê li hember PDK Îranê û fîdakarî û ked û zehmet û karê berçav yê Kadro û Pêşmergeyên partiyê bilind hesiband û ev yek gelek girîng nirxand û spasiya wan kir.

Di pareke din ya karê pilînomê de, rapora komîteya kar û barên partiyê li derveyî welat di warên rêxsitin, peywendî û ragihandinê de, ji aliyê berpirsiyarên wan beşan ve hate pêşkêşkirin. Beşdarên civîna Komîteya Navendî ya PDK Îranê dîtin û nêrînên xwe li hember kar û çalakiyên partiyê li derveyî welêt bi rizamendiyê ve xuya kirin û gelale û bernameya pêşniyarkirî ya wê komîteyê ji bo kar û barên pêşerojê bi hinek têdîtinan ve bi jêhatî û baş zanî û bi Deftera Siyasî rasipard ku li gorî îmkanê ji bo serxistina wan pirograman gavan bavêje.

Di beşke din ya karê pilînomê de, erk û nêrînên partiyê hatin şîrovekirin û civînê li ser vê çendê tekez kir ku bername, proje û armancên diyarîkirî yên Kongireya Sêzdehemîn ya partiyê di çarçoveya sîstemekî nû û îroyîn de bicih bîne.

Di beşeke din ji karê pilînomê de, berpirsiyarên parek ji organan hatin diyarîkirin û her wiha birêz **Mecîd Heqî**, Berpirsiyarê Beşa Ragihandina Komîteya Kar û Barên Partiyê li derveyî welat, wek endamê cihgir yê Komîteya Navendî, Xûşka **Şikofe Qubadî** û Xûşka **Miryem Elîpûr**, Kekê **Ebdulriza Kerîmî** û Kekê **Sadiq Zerza** wekî endamên Şêwirmend yên Komîteya Navendî hatin hilbijartin.

Di dawiya xebatên pilînomê de, Komîteya Navendî hate agehdarkirin ku piştî hewildaneke berbiçav û berdewam, roja 2'yê Şibata 2007'an, weke nûnerê neteweya Kurd li Kurdistana PDK Îranê bi endamê Rêxistina Neteweyên Bênûner (UNPO) a navneteweyî hatiye wergirtinê. Pilînomê eva bi gaveke din ji ber bi pêşveçûnê û destkevteke berçav û mezin ji bo PDK Îranê û tev xortên neteweya Kurd li Kurdistana Îranê hesiband û şabûn û kêfxweşiya xwe di vê derheqê de da xuya kir û pîrozbahî ji xelkê Kurdistanê kir.

Beşdarên civîna berfireh ya Komîteya Navendî ya PDK Îranê piştî bi encamgihandina erkên diyarîkirnî yên pilînomê bi seheke tejî ji canê alîkarî û hêvî bi serkevtinê, demjimêr 18'ê êvariya roja şemî, 3'ê Şibata 2007'an, dawî bi kar û xebatên xwe anîn.

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**

**Deftera Siyasî**

**04.02.2007**

www.arsivakurd.org

# Nûneratî Di "UNPO"ê De

**Ebdula Hicab**

Di civîna Desteya Serokatiya Rêxistina Netewe û Gelên bê Nûner (Unrpresented Nations and Peoples Organization) ku di roja 1 heta 3'ê Şibata 2007'an de li avahiya "Altiero Spinelli" ya Parlemana Ewropayê li Birûksela serbajarê Beljîkayê de birêve çû, daxwaza PDK Îranê ji bo endamwergirtina gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê di vê rêxistinê de hate qebûlkirinê.

PDK Îranê heyameke berbiçav bû ku weke çavdêr têkilî bi rêxistina "UNPO"ê re hebû û bi pişikdarîkirin di civîna civata giştî ya vê rêxistinê di Çiriya Pêşîn ya 2006'an li bajarê Taype a welatê Taywanê de, gavekê ji endametiyê nêzîk bibû. Lê vê carê dûyratiya dûr û dirêj ya di navbera çavedêrî û bi endambûnê de bezand û di vê ezmûn û ceribîna dîplomatîk de jî serkevtiyane derket. Piştî biryara serokatiyê, pêvajoya siyasî û asayî ya bi endambûnê eva ye ku bexşîna fermî ya endametiyê di civîna pêşîn ya civata giştî de pesend bike.

Eva ku misoger bûye eva ye ji roja 4'ê Şibata 2007'an ve Alaya Kurdistanê û cihê Rojhilatê Kurdistanê di nava gelên din yên bênûner de hatiye destnîşankirin û di prosesa rizgariya neteweyî de, em jî tevî gelên hevqeder yên xwe di qada cîhanî de bi dengeke hevpar ve dê tevbigerin.

"UNPO" rêxistineke medenî ya cîhanî ye ku li cihê welatan, endametiya neteweyan bi bingeh digire û li ser bingeha demokrasî û mafên gelan ji bo diyarîkirina çarenivîsa siyasî ya wan dixebite. Endamên vê rêxistinê her weke di rêbazên giştî yên wê de hatiye, pêk hatiye li gelên xwecih (bomî), neteweyên welat lêdagîrkirî, kêmanî û ew welatên serbixwe yan herêmên xwebirêvebir ku bo parastina mafên kulturî û mirovatî yên xwe hev girtine. Endamên rêxistinê bêdestêwerdan di kar û barên hev de, bo peydakirina rêçareyên aştiyane ji bo ew pirs û dozên ku pêwendî bi jiyan û çarenivîsa wan ve heye û cehdê dikin û dixebitin ku siyaseteke jîngehparêziyê birêve bibin.

Merema sereke ya rêxistina "UNPO"ê eva ye ku daxwaza siyasî ya her neteweyekê bi vî awayî ku netewe bi xwe diyarî dikin, di cîhanê de bide nasandinê û biryara hemû endamên wê li ser awayên diyarîkirina çarenivîsa wan piştgirî lê bihê kirinê. Tevî cudahiya biryar û metoda diyarîkirina çarenivîsê, aliyê hevbeş yê endamên "UNPO"ê nebûna nûneratiya wan di civakên dewletî û Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de ye. Armanc ji pêkhatina vê rêxistinê di sala 1991'ê de eva bû ku dûyratiya navbera sîstema îro ya cîhanê û dezgeh û saziyên siyasî tejî bike û dengê fetisandî yê neteweyên bêdewlet bigihijîne cîhanê.

Her çend rêxistina "UNPO"ê pêwendiya rêxistinî, anku girêdayî bi tu yek ji wan rêxistinane nine ku nûneratiya welatên serbixwe bikin, lê him bo rêxistina UN'ê him jî bo komîsyona Mafê Mirovan ya vê rêxistinê, weke çavkaniyeke girîng ya zanyarî û agadariyan li ser gelên bêdewlet tê hesibandin. Lewra "UNPO" weke terîbûn û dengê gelên bê nûner di cîhanê de hesab jêre tê kirinê û roj li pey rojê girîngî û hitbara wê diçe jor.

Di Kurdistanê de, tevî wê ku nav û dengê rêxistina "UNPO"ê mêjdem nine ku ketiye rojeva siyasî ve, lê pêtir ji 16 sal e ku ev rêxistina û daxwaza gelê Kurd rêvîngên rêyekê ne. Ji aliyê gelê Kurd ji Başûrê Kurdistanê ve Partiya Demokrat ya Kurdistanê û Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê endamên "UNPO"ê ne û ji sala 1991'ê ve di vê rêxistinê de pişikdar in. Herwiha Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêwendiyeke xurt bi "UNPO"ê re heye, lê ji Bakûr û Başûrê Rojavayê de heya niha tu partî û rêxistineke siyasî weke endam nehatiye wergirtinê û daxwaziyeke bi vî awayî jî heya niha negihîştiye desteya serokatiya "UNPO"ê.

Ji aliyê din ve gelên hevqeder yên me di Îranê de cehda endametî di vê rêxistinê de didin û pêregihîştin bi daxwaziya gelê Belûç bo endametiyê di rojeva desteya birêveberiya "UNPO"ê de ye. Gelê Ereb li Ehwazê endamê vê rêxistinê ye û Dr. Kerîm Abidiyan, berdevkê Partiya Hevbendiya Demokratîk a Ehwazê endamê çalak û jêhatî yê desteya birêveberî ya "UNPO"ê ye. Hevdem tevî gelê Kurd, gelê Azerbaycana Îranê jî ji rêya Bizava Neteweyî ya Azerbaycana Başûrê ve bû bi endamê vê rêxistinê.

Di nava neteweyên endam di "UNPO"ê de, heya niha 6 endam û ji vana her sê welatên Baltîkê: Lêtonî, Lîtvanî û Stonî piştî bidestveanîna serxwebûnê, bûn bi endamên Neteweyên Yekbûyî û ji endametiya "UNPO"ê derketin. Lê welatên weke Taywan û Abxaziya ku herçend xwedî statûyek serbixwe ne, niha jî her wek endamên çalak yên rêxistinê kar dikin û di refa neteweyên hevqeder de mane. Hejmara endamên rêxistinê vê gavê 69 endam in.

Ji aliyek din ve, şanda PDK Îranê bi pişikdariya xwe xerîteya siyasî ya Rojhilatê Kurdistanê bi hemû partî û rêxistinên siyasî yên nû û kevn yên amadebûyî da nasandinê û ew xatircem kirin ku di tu dem û qonaxekê de ji dîtina berjewendiyên partîtiyê ve naxebitin. Bi vê wateyê ku nûneratiya PDK Îranê dê bibe terîbûna hevpar ya hemû gelê Kurd li aliyê medenî û siyasî yê opozîsyonê ve ku destê wan bi terîbûnên navneteweyî re nagihîje.



Birêz Ebdula Hicab di civîna "UNPO"yê de

Wergirtina gelê me di rêxistina "UNPO"ê de tê wateya nuqte guhartineke siyasî û herwiha bawerînameyeke dîplomatîk e ku xebata rewa û berheq ya neteweyî a me di Rojhilatê Kurdistanê de bidestve anî. Bo PDK Îranê jî zêdebûna şanaziyeke din bi hejmara şanaziyên dîrokî yên dinê ku di dîroka tekoşîna xwe bo rizgariya neteweyî ya me de tomar kiriye. Hemû cehd û tekoşîna Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê nasandina xebata rewa û berheq ya neteweya me bi dezgeh û navendên cîhanî ye û di vê derheqê de partiya me endametiya di "UNPO"ê de, ne wek alaveke bazirganî ya siyasî, belkî weke gavek ber bi rizgariya neteweyî bikar tîne.

Lê bi bêy piştevaniya civatên xelkê Kurdistanê û dengeke teba di nav refên tevgerê de, ne ev destkevta û ne jî şanaziyên dîrokî yên dinê jî dikarin şûnwarê dîktatoriyê di welatê me de paqij bikin û bibin bi mizgîniya rizgariyê. Weke di bersiva birêz "Marino Busdachin", Serokê Îtaliyayî yê "UNPO"ê ku qala sedemên pêşketina bi endamwergirtina PDK Îranê dikir, got ku "meywe û êmîşê serpayîzan baştir digihîje, direng dirize û tama wê zêdetir dimîne". Berhema xebat û tekoşînê jî demekê keniyê têxe ser lêvên endamên malbata mezin ya Kurdistanê ku tovê dijberiyê di nava bizav û tevgerê de qut bibe û ji holê bihê rakarinê, yekîtiya neteweyî cihê demargirjiyê bigire û dengê govenda hevalbendiyê bibe bi piştevan û alîkariya gavên me.

Em bi yekîtî û yekrefiyê dikarin endametiya di "UNPO"ê de bikin bi destpêka destkevtên mezintir bo neteweya xwe.

Bo zanyariyên zêdetir serdana wan malpera bikin:

**http://www.unpo.org**
**http://www.pdki.org/articles.php?lang=1&article_id=1216**
**http://www.unpo.org/article.php?id=6251**

**Wegeran ji Soranî bo Kurmancî: Selîm Zencîrî**

# "UNPO" Dergehek Ji Bo Navneteweyî kirina Pirsa Kurd

Di civîna rojên 1 – 3 Şibata 2007'an ya "UNPO"yê de, Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê wek endamê wê rêxistinê hate wergirtinê.

Endambûna Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê di "UNPO"yê de wek gavek giring bo navnetewîkirina pirsa Kurd tê dîtin.

Rêxistina Netewe û Gelên Bênûner di Neteweyên Yekbûyî de rêxistinek demokratîk, navneteweyî ye ku endamên wê nûnerên neteweyên bindest, welatên hatî dagirkirî û kêmaniyên neteweyî û welatên serbixwe ne yên ku dixwazin mafên mirov û çandî yên welatiyên xwe û jîngeha xwe biparêzin û pirsgirêkên xwe bi awayekî aştîxwazane çareser bikin. "UNPO" ji bo endamên xwe atmosforek yasayî di warê çalakiyên navneteweyî de pêk tîne.

Piraniya endamên "UNPO"yê ne di rewşek wek hev de ne, lê wekî yek mercên endambûnê yên endamên "UNPO"yê, endametiya wan di saziyên navneteweyî weke Rêxistian Neteweyên Yekgirtî (UN) de nînin, ji ber wê yekê jî şansê beşdariya wana bo pêşveçûna pirsên têkildar bi parastina mafê mirovan tevî astengan tê rûbirûbûn.

Li gor "UNPO"ye, zêdeyî 90 ji sedê ya pirsgirêk û kêşeyên rojava niha pirsgirêkên navxweyî ne. Ji bo bersivdan bi valahiya sîstema niha ya navneteweyî "UNPO" pêk hatiye. Endamên pêkîner yên wê saziyê ew rêxistin û partî ne yên ku ji aliyê bingehên navneteweyî yên xwedî desthilat girîngî pê nayên dayînê.

Dirûşma "UNPO"yê tolêrans wate hevsazî, demokrasî, mafê mirovan û mafê diyarîkirina çarnivîsê ye.


Bizava gelê Kurd bi salan e bi wê encamê gihîştiye ku bêy navneteweyîkirina pirsa Kurd, di çarçovaya welatên ku Kurdistan di navbera wan da hatiye parvekirin, nayê çareserkirin. Ji xwe, pirsa Kurd nikaribe tenê bibe pirsa çend dewletên herêmê weke Îran, Turkiye û Sûriye an Îraqê.

Di serdema cîhanêbûnê de ku bi sedan hezar Kurd akinciyên welatên Rojava bûne, pirsa Kurd beşek ji pirsa wan welatan e û hetanî pirsa Kurd çareseriyê bi xwe nebîne, beşek ji civaka welatên Rojava jî nikaribin bi rehetî di nav civaka wane de "intigire"(têkilî yan tevlîhevbûn) bin û bibin beşek li endamên civaka welatan. Lewra çareseriya pirsa Kurd di rastî de çareseriya pirsgirêkek civakî jî ye ji bo welatên xwedî desthilat. Ji aliyekî din ve bona deverek aloz wek Kurdistanê ku serekaniya nift, av û gelek dewlemeniyên din yên Rojhilata Navîn e, rê nade herêmê û nemaze welatên weke Îran û Turkiyê ku pêşveçûnên li gor hewcehiya serdema cîhanîbûnê bi xwe bibînin.

Digel hebûna wê rastiyê, astenga herî mezin ku pêşiya pêşveçûna pêvajoya pirsgirêka gelê Kurd girtiye, endametiya dewletên hakim li ser Kurdistanê di Neteweyên Yekbûyî ye. Dewletên endam di Rêxistina Neteweyên Hevgirtî, ji ber berjewendiyên aborî yên welatên xwe amade nînin pirsa Kurd di Neteweyên Yekbûyî de binîn rojevê.

Dr. Ebdulrehman Qasimlo rêberê bizava netewî ya Rojhilata Kurdistanê ji 30 salan berêve xebat ji bo nêzîkbûn bi bingehên navneteweyî ji bo cîhanîkirina pirsa Kurd dest pê kir. Endambûna Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di Enternasyonal Sosyalîst de berhema wê xebatê ye ku di şûn de Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistan û HADEP jî bûn endamê wê malbatê.

Di civîna Şibatê ya "UNPO"yê de, nûnerê Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê rêzdar **Ebdulla Hicab** digel şirovekirina rewşa siyasî û mafê mirovan ya gelê Kurd di Rojhilata Kurdistanê de got: "Armancên me yên havbeş mafê wekhev, demokrasî, mafê mirovan û mafê neteweyan bo çarnivîsa xwe ye. Ji bo me pêwîst e ku baştirîn rêyê ji bo hevxebatî û piştgiriyê peyda bikin. Em bawer in "UNPO" berpirsiyariya wê heye ku dengê neteweyên endam bigehîne bingehên navneteweyî. Lewra ewa ji bo Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û gelê Kurd li Kurdistana Îranê delîve û fersendek dîrokî ye ku bibe endamê wê malbatê.



**Mecîd Heqî – Fînland**

Endambûna Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di "UNPO"yê de tevî Partiya Demokrat a Kurdistanê û Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê sêgoşeyek giring û bihêz ji bo pêşvebirina pirsa Kurd di warê navneteweyî de pêk tîne ku serkevtina wê berî her tiştekê girêdayî bi asta alîkariya wan partiyên Kurd heye.

Wek siyaseta navneteweyî ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, xebat di asta navneteweyî de ji bo diyarîkirina mafê çarenivîsa gelê Kurd li gor zagonên navneteweyî berpirsiyariyek giring dixe ser milê wê partiyê ji bo bihêzkirina dîplomasiya Kurdên Rojhilata Kurdistanê û rojevkirina doza Kurd li Îranê.

## 3 Partîyên Din Yên Neteweyên Îranê Tevlî Kongireya Neteweyên Îrana Federel Bûn

**Daxuyanî**

Di 27.01.2007'an de, piraniya endamên fermî yên Kongireya Neteweyên Îrana Federel, civîna xwe ya devreyî li Londonê pêk anîn.

Dî vê civînê de rapora xebat û çalakiyên kongirê hate pêşkeşkirin.

Piştî bas, niqaşan û guhertina bîr û rayan, bernameya kar û xebatên kongirê ji bo sala 2007'an hate pejirandin. Herwiha sê sazî û partiyên din 1- Partiya Azadiya kurdistanê 2- Tevgera Hişyariya Netewî ya Azerbaycana Başûr 3- Civata Çandî a Kurdên Xurasanê, ku daxwaza endambûnê di Kongira navhatî de kiribûn, piştî vekolînê bi dengdaneke giştî ji aliyê endamên Kongirê ve hatin wergirtin.

**Kongireya Neteweyên Îrana Federel**
**31.01. 2007**

www.arsivakurd.org

**Dr. Xusro Ebdulayî, Berpirsiyarê Têkiliyên Navneteweyî Yên PDK Îranê:**

# "Ev Rêxistine dibe Bi Berpirsiyarek Heta Ku Meseleya Kurd Weke Neteweyekê Bîne Ziman Û Bibe Pêş"

Xwendevanên hêja!

Çend rojan berî niha Dr. Xusro Ebdulayî, berpirsiyarê têkiliyên navneteweyî yên PDK Îranê li derveyî welat seredana Kurdistanê kir. Me jî derfet bi girîng zanî heya ku ji nêzîk ve hevpeyvînekê li dor têkiliyên navneteweyî yên partiyê û herweha hin pirsên di rojeva siyasî ya Îran û cîhanê de pêre çê bikin ku em bala we bo xwendina wê dikişînin:

**Pêwendiyên PDK Îranê bi kom, komele, dezgeh û rêxistinên navneteweyî re çawa ye? Hûn wek PDK Îranê çawa tên pêşwazîkirinê yan bi awayekî din giranî û pêgeha partiyê di qada navneteweyî de çiqas e?**

Ez jî spasiya we dikim ku we ev derfeta pêk anî ku em bikarin hinekê qala hin meseleyên rojev û partiyê bi taybet pêwendiyên wê li derve de bikin. PDK Îranê, partiyeke biprensîp, demokaratîk û rêkûpêk e. Xebat û tekoşîna partiyê di pile û gava yekemîn de demokrasî, pêşkevtin û rûmetdanîna bi mirovatiyê ye. Ew pirensîp û bihayane hin tişt in ku cîhana pêşverû û şaristanî piştgiriyê lê dikin, bi taybet dema ku mirov di kiryar de jî wan pirensîpan biparêze. Partiya me çi di hundir û kongireyên xwe de û çi jî di pêwendî û danûstandinên xwe de tim wan pirensîpane diprêze. Lewra PDK Îranê di qada navneteweyî de xwedî rûmetek mezin e, vêca li rêxistinên siyasî re bigire heta digihîje sazî û navend û dezgehên navneteweyî yên ku mafê mirovan diparêzin. Ew piştgiriya xebat û tekoşîna partiya me dikin, xebata me jî bo demokrasî û mafê gelê Kurd di Kurdistana Îranê de ye. PDK Îranê weke berpirsiyarê meseleya Kurd di Îranê de, berpirsiyarê neteweyeke 10 Milyon kesî di Îranê de ye û ev meseleya jî yek ji faktorên demokrasiyê di Îranê de ye.

Lênihêrînek bi dirûşma partiya me him li rabihurî û him jî niha derdixe ku daxwaza sîstemek demokratîk û Federal di Îranê de dike. Di rastî de peyva demokrasiyê esas û bingeha PDK Îranê ye. Dema ku mirov di cîhana îroyîn de li ser buha, erziş, pirensîp û rûmetên însanî dixebite û di hundirê partiyê de û di kiryarên rojane yên xwe de nîşan dide, dunyaya şaristanî tim li pişt disekine. Çunku dunya hatiye guhertin, rewş û zirûf û mercên siyasî hatine guhertinê, lê ji aliyê din ve jî eşkere ye ku qazanc û berjewendiyên taybetî hene, Lê ew jî dikare were guhertinê.

Ji ber wan mercane ye her cihê ku em weke partî bo seredan diçin vêca ji Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, Komîsyona Mafê Mirovan, Komîsariyaya Bilind ya Penaberan, Enternasyonal yan Efûya Navneteweyî re bigire heta digihîje partiyên siyasî, organên cur bi cur yên mafê mirovan, Parlemantar û dem û dezgehên siyasî û mirovî û ..., de em bi germî tên pêşwazîkirinê û em xwedî pêwendî û danûstandinên navneteweyî yên pir berfireh bi taybetî di welatên rojava de ne. Çunku dizanin ku ew buha û pirensîpane di nava partiyê de cihgir bûne û wan tiştane weke taktîk û bo siyaseta roj bikar naîne, ji ber ku kiriye bi stratejiyek neguher û berdewam.

**Bi xweşî ve em haydar bûn ku PDK Îranê di gaveke dîrokî de bû endamê fermî yê "UNPO" a ser bi Rêxistina NY'î. Bêguman eva jî destkevtek**

**Hevpeyvîn: Selîm Zencîrî**



**girîng û dîrokî ye bo gelê Kurd bi taybet di Îranê de. Bi raya we ev endametiya çi tesîr û bandorek li ser pirsa Kurd li Îranê û PDK Îranê heye?**

Her wekî min got hinek pirensîp hene ku mirov bi hebûna wan ve dikare di rêxistinek wiha mezin û girîng de bibe endam. Ew pirensîp jî demokrasî û mafê mirovan e. Baweriya berdewam bi wan di kiryar û piratîkê de bû bi sedem heta ku partiya me di hin dezgehên navneteweyî de were wergirtinê û bibe endam. Yek ji wan jî Enternasyonala Sosyalîst e ku eva 13 sal e em endamê wê ne. Enternasyonala Sosyalîst jî saziyek navneteweyî ye û nêzîk 150 partî di seranserê cîhanê de têde endam in.

Eva jî gava duyemîn bû ku em di rêxistina "UNPO", yan Rêxistina Neteweyên Bênûner de bûne endamê fermî. Her bi vê hincetê ez jî pîrozbahiyê ji hemû Kurdan, ji hemû endam û alîgirên partiyê bi taybet ew hevalên ku di vî warî de xebitîne û xwe mandî kirine, dikim.

Tesîra wê eva ye ku ev rêxistina rasterast di Neteweyên Yekbûyî de endam e û ji heq û mafê neteweyên bêdewlet berevaniyê dike û mafê wan diparêze.

Eva jî rêyek e ku em dikarin ne rasterast di rêxistina NY û organên cur bi cur yên wê de bibine xwedî deng. Eva jî gavek girîng û deskevtek dîrokî ya kurdên kurdistana Rojhilat û PDK Îranê ye. Di rastî de ev rêxistina dibe bi berpirsiyarek heta ku meseleya Kurd weke neteweyekê bîne ziman û bibe pêş.

**Aqibet Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî li gor biryara 1737'an, qonaxa yekem ya cezayan li dor programên navikî li ser Îranê de birêve bir. Herweha 60 roj dem bona rawestandina xebatên Etomî jêre diyarî kir. Hûn li gor siyasetên rejîmê bawer in ku ceza dê xurtir yan dijwartir bibin?**

Meseleya programa Etomî ya rejîmê, pirsek e ku aştiya cîhanî dixe xeter û metirsiyê. Rejîma Îranê di vê çarçoveyê de heya niha gelek leyîstok kirine bi taybet tevî welatên Ewropayî, û bi wan lîstekan tenê dixwest demê qazanc bike. Lê di vê dawiyê de welatên Ewropayî bi taybetî Firansa, Îngilîstan û Almaniya ji armancên rejîmê tê gihîştine. Berê jî çunku qazanc û berjewendiyên wan pir zêde bûn, dixwestin ji rêya dîplomasiyê ve rejîmê hişyar bikin ku dest ji xebatên Etomî yên xwe berde û bi vî awayî rejîmê aqil bikin. Lê di rastî de ev rejîme ne rejîma aqilbûnê ye û dixwaze di deverê de bibe bi rejîmek bihêz û serdest. Bona gihîştin bi vê armancê jî bi du awayan pêşve diçe.

1: Îslamgerayî(Ew jî di rastî de Şîîgerayî ye nek Îslamgerayî)

2: Bidestxistina çeka Etomî.

Lewra niha ew welatane bi giştî û Rêxistina NY'ê gihîştine vê baweriyê ku xebatên navikî yên rejîmê ne aştîxwazane û bona vejenê ye, ji berku armanca wê bidestvanîna çeka Etomî ye. Lewra niha bi micid pêre dilivin, ceza di gava yekem de biryara 1737'an e û tenê bona wê yekê bû ku rejîmê bînin ser eqil, ger ku rejîm dest ji siyaset û xebatên xwe ji bo bidestveanîna çekên Etomî hilnegire, gavên din yên cezayan dê roj li pey rojê zêde û berfireh û dijwartir bibin.

**Başe tesîra wan ceza yan dorpêçikirinan li ser xelkê Îranê û pêşroja rejîmê çiye?**

Di gava yekem de ew alav û amûrên ku bo çêkirina çeka Etomî tên bikaranînê, rejîm nikare wisa rehet û bi hêsanî dest bixe. Çunku ger caran bo mînak nirx û buhaya wan 10 milyon bû, evcar dê bibe

www.arsivakurd.org

## Ger ku rejîm dest ji siyaset û xebatên xwe ji bo bidestveanîna çekên Etomî hilnegire, gavên din yên cezayan dê roj li pey rojê zêde û berfireh û dijwartir bibin

100 milyon. Tesîra xwe her niha daniye û hemû tiştek nirxa wan sê yan çar beramber zêde bûye. Eşkere ye ku dê li ser jiyana xelkê bi taybetî ew texên ku belengaz, zehmetkêş û hejar in, dê pêtir tesîr û karîgeriya nerênî hebe. Ji ber ku niha 60 ji sedê ya xelkê Îranê di bin hêla xizanî û feqrê de dijîn û jiyanê diborînin.

Eva jî di rewşekê de ye ku hêj neketiye hisara di warê aborî de. Ger gavên din bo dorpêçkirina Îranê bihên avêtin, xwezayî ye ku dê tesîrê li ser jiyana rojane ya xelkê hebe û dê giranî Îranê dabigire. Îran jî di astekê de nine ku rewşa aboriya wê bersivder be. Tenê karta niftê heye û me dît ku buhaya wê di vê heyamê de hinekê giran bibû, lê niha Erebistana Seûdî û ... ku neftek zêdetir berhem tînin, buhaya wê şikestî ye û ji 80 $ daketiye 60 $. Eva jî di halekê de ye ku pisporên siyasî û aborînas bawer in ku dê heta 30 $ jî dakeve. Di encam de rewşa Komara Îslamî bi awayekê nine ku bikare li hemberî vê ambarboyê de dewamê bîne.

**Kek Xusro, hûn rola Komara Îslamî di bûyerên deverê de weke pêkanîna alozî maytêkirin di kar û barên welatan de û herweha xurtkirina terorîzmê de çawa dinirxînin?**

Komara Îslamî di esas de rejîmeke terorîstî ye û bingeha wê li ser terorîzmê hatiye avakirinê. Terorîzm yek ji alav û kartên zext û givaşa rejîmê ye. Eva jî ne tiştek veşartî û teze ye, çunku Xomeynî berê jî digot: "Sidûrê Inqilab" yanî şandina şoreşê bo derve. Bo vê meremê jî armanca wan ya yekemîn, welatên derdor e weke Îraqê. Eva jî di halekê de ye ku ne tenê Amerîkî, belkî rayedarên Îraqî jî destêwerdanên Îranê û çêkirina aloziyan di Îraqê de piştrast dikin. Armanca rejîmê ji karên têkderî di Îraqê de eva ye ku prosesa demokrasiyê di Îraqê de bêencam bihêlin û li pêşiya xwasteka neteweyên Îraqê ku avakirina sîstemek demokratîk e bibin asteng. Çunku ger di welateke deverê weke Îraqê de tenahî û demokrasî cihgir bibe, bandora wê ya rasterast li ser welatên cîran bi taybet Îranê heye. Lewra Komara Îslamî bi hemû karîn û şiyana xwe dixebite ku beriya avakirina vê sîstema îroyîn û demokratîk bigire. Bona gihîştin bi vê armanca xwe jî dest avêtiye kiryarên terorîstî, pêkanîna alozî û neewlekirinê, piştevanî ji girûpên tundrew û terorîstî ji Îraqê re bigire heta digihîje Filistîn û Lubnanê. Dizane ku bi wê siyaset û sîstema dîktatorî û dijî mirovî nikare jîna xwe bidomîne. Lewra bi hemû şiyana xwe dijatiya vê prosesa aştî û demokrasiyê dike û qazanc û berjewendiyên welatên bihêz di deverê de dixîne ber xeterê.

**Kek Xusro, heyamek e êrîşa leşkerî li dijî Îranê yê bûye mijara sereke ya medyayan. Raya we di vê derheqê de çi ye?**

Êrîşa leşkerî carê weke hilbijartin nehatiye erêkirin û pejirandin. Çunku rayedarên Amerîkayî, Ewropayî û Neteweyên Yekbûyî carê dixwazin bi rêya dîplomasiyê ve vê pirsê çareser bikin. Lê Komara Îslamî rejîmek nine ku bikare meseleyan bi rêya dîplomasiyê ve çareser bike. Rejîm dizane ku mayîna wê, bêy çeka Etomî nemimkin e, lewra bi her awayekê be dixwaze bidestve bîne û jêre bûye tiştek heyatî û meseleya man û nemanê. Bê şik destxistina wê jî xeterek mezin e bo ser aştiya cîhanî. Lewra ez bawer im rêçareya demokrasiyê di Îranê de ne êrîşa leşkerî ye



## Komara Îslamî Di Esas De Rejîmeke Terorîstî Ye Û Bingeha Wê Li Ser Terorîzmê Hatiye Avakirinê. Terorîzm Yek Ji Alav Û Kartên Zext Û Givaşa Rejîmê Ye

û zirûfa îroyîn jî ew nine, meger rejîm wan neçar bike, lê rêyên din jî hene...

**Bibore, başe mikanîzma we weke PDK Îranê di vê derheqê de çiye?**

PDK Îranê bawermend bi hêza neteweyên Îranê ye û bi salane xebatê dike ku ev hêzên demokrat, pêşverû û bi giştî opozîsyona demokart ya Îranê bicivîne ser hev.

Li Îranê şeş neteweyên din hene ku ji mafên xwe hatine bêparkirinê û daxwaza mafên xwe dikin. Niha meseleya neteweyî di seranserê cîhanê de girîngî peyda kiriye û bûye bi meseleyek rojev. Herweha di Îranê de jî niha pirsa neteweyî xurt bûye û rojeva Îranê bi xwe ve girtiye.

Lewra PDK Îranê weke hêzeke modern ku bawerî bi mafên wan neteweyan heye di vê derheqê de gelek xebat kiriye bo mînak

## PDK Îranê Bawermend Bi Hêza Neteweyên Îranê Ye Û Bi Salane Xebatê Dike Ku Ev Hêzên Demokrat, Pêşverû Û Bi Giştî Opozîsyona Demokart Ya Îranê Bicivîne Ser Hev

eva 2 sal e ku kongireyek hatiye avakirinê bi navê **Kongireya Neteweyên Îrana Federal** weke altirnatîvek bo pêşeroja siyasî ya Îranê.

Em dixebitin ku hêzên wan neteweyan bi hêzên opozîsyona demokrat a Îranê re girê bidin û vê rêxistinê xurtir bikin. Lewra hewce ye hêzên derve bi taybetî yên Rojava piştgiriya van hêzane û rêxistinê bikin û wê rêxistinê bihêz û xurttir bikin. Bi raya me rêçare û mikanîzma jêhat û herî baş eva ye nek êrîşa leşkerî. Ger heya niha Amerîkî û Ewropayî zêde ji vê meseleyê tê negihiştibin,ez bawer im gelek dûr nakişîne ku dê bihêne ser baweriya me.

**Hûn pêşeroja Kurdan bi giştî û di Îranê de bi taybetî di encama van hevkêşe û guhertinan de çawa dibînin? Gelo tu geşbînî yan na?**

Belê, ez geşbîn im. Çunku niha meseleya neteweyan, meseleya mafê mirovan û demokrasiyê bûne bi mijarên rojev. Bi giştî sîstem hatiye guhertin, dunya hatiye guherîn. Êdî dema wê nemaye ku neteweyek çend neteweyên din têxe bin destê xwe.

Mirovahî êdî pesinda vê sîstemê nake. Lewra niha dewletên mezin gihîştine vê qenaetê ku divêt di hemû welatan de bi kêmî jî be demokrasiyek nisbî hebe, mafên neteweyan bihên parastin. Bi taybet di welatên pirneteweyî de divêt mafê hemû neteweyan misoger be. Amerîka caran gava ku diçû û welatek digirt, kar bi sîstema wê tunebû, dîktatorek li ser kar didanî û temam. Lê niha ew mikanîzma nema ye. Bo nimûne em Îraqê dibînin ku Amerîka têde piştgiriya sîstemek Federal dike û Kurdek dibe Serok Komarê Îraqê. Bi giştî reform di sîstema cîhanî de pêk hatiye û cîhan ber bi demokrasiyê ve diçe, eva Îraq, Efxanistan û ...

Lewre ez him pêşeroja Kurdan û him jî neteweyên din geş dibînim û hêdî hêdî dawî bi jiyê sîstemên dîktatorî tê û dê jinav biçin. Kê bawer dikir ku Sedam were dadgehîkirin. Eva jî nîşaneya neman û dawîhatina sîstemên dîktator e. Wek Kurdekê ez gelek xweşbînim ku ev rejîme nikare dewamê bîne. Çunku dijberiya Komara Îslamî bi mirovahî û sîstema pêşkevtî ya cîhana îroyîn heye.

**Kekê Xusro Ebdulahî, ez ji aliyê rojnameya Agirî ve spasiya beşdariya te di vê hevpeyvînê de dikim. Her bijî û serkevtî bî.**

Spas bo we jî, serkevtî bin

www.arsivakurd.org

# Cudabûnên Nava Refên PDK Îranê, Sedem Û Encamên Wan!



**Têmûr Mistefayî**

**Beşa 2**

Taqima Heft Kesî eger çi veqetiyana xwe îlan kirin, lê yan di bin rênîşandayînên partiya "Tûde" yan bi her sedemeke din di partiyê de xîmbir nebûn û her heyamekê piştî cudabûnê paşmayiyên vê hizr û ramanê bi awayekî din dubare serhilda û Rehman Kerîmî ku endamê Komîteya Navendî bû di kilaseke Kadroyan de ku di payîza 1359 (1980)'an de pêk hatibû, ragihandibû ku Pasdar nîhada şoreşê ye û şerkirin tevî Pasdaran liv û tevgereke dijî şoreşgerane ye û li pey heyameke kurt xwe gihande cem hêzên Niho û Simko û li wir tevî Senar Mamedî û Cehangîr Îsmaîlzade ku endamên Komîteya Navendî bûn û curek nerihetî ji partiyê hebûn, hev girtin û bi hevahengî tevî hêzên rejîmê şerê hêza Pêşmerge dikirin, heta li gor pîlanekê, rejîmê dixwast ji rêya Rehman Kerîmî ve Senar Mamedî bigire, lê Senar Mamedî bi vê pîlanê haydar bû û Rehman Kerîmî girt û îdam kir.

Hetanî piştî çûna Rehman Kerîmî dîsan paşmayiyên hizr û ramana "Tûde"yî di nava partiyê de man û tirsinokane bi awayekî veşartî mijûlê tagiriyê di nav refên partiyê de bûn. Ji aliyekê ve Dr. Qasimlo bo ji holêkirina ev şêwaza hizr û ramanê di nava refên Partiya Demokrat û sînordanîn di navbera partiyê û şêwaza ramana "Tûde"yî de û di heman demê de ji bo nîşandana vê rastiyê ku di Sosyalîzma heyîn a vê demê ku nebûna demokrasiyê wek kêmasiyeke xuya û berbiçav e, lewra armanca dawîn ya Sosyalîzma Demokratîk berê di civîna Komîteya Navendî û piştre di kongireya Şeşem de anî ber bas. Di vê demê de taqima bi cî mayî ya ser bi hizra "Tûde"yî bi xwe ketin û dest avêtin piropagendeyeke berfireh û parek ji ciwan ji bo nîşandana rûreşî ya Sosyalîstbûna xwe dest avêtin xwandina pirtûkên kevnbûyî yên çaxê Lenîn û Marks. Ev pirtûkene her ji aliyê partiya "Tûde" ve hatibûn wergerandin û şirovekirin û xwe ji bo şer di Kongireyê de li dijî Sosyalîzma Demokratîk û bi gotina xwe piştevanî li sosyalîzma heyîn amade dikirin. Di Kongireya Şeşem de bi hatina rojeva Sosyalîzma Demokratîk weke armanca pêşeroj ya partiyê, gengeşe û nîqaş bi tundî dest pê kirin. Yek ji axafveran Celîl Gadanî bû, wî di axavtina xwe de digot "Sosyalîzm pêşgir û paşgir hilgir nine û zêdekirina pêşgir û paşgiran îxanete bi armanca sosyalîzmê ye". Evên din jî hem bi vî awayî û derbarê vê mijarê axavtinên xwe domandin, her yek ji wan di pirtûkekê de çend hevok û gotinek Mars û Lenîn nivîsandibûn û li dijî Sosyalîzma Demokratîk wek fakt (belge) dianîn, lê di encam de Sosyalîzma Demokratîk di Kongireyê de hat pejirandin.

Piştî kongireyê rêberiya partiyê ji wan kesên ku li dijî Sosyalîzma Demokratîk bûn re ragihand ku divêt ji bo cihgirkirina vê biryarê di partiyê de hewl bihê dan, lewra ku niha Sosyalîzma Demokratîk hatiye pejirandin û bûye rêbaz û baweriya partiyê, divêt ji bo zeliqandina wê hewl bihê dayîn, lê alîgirên "Tûde"yî yên nav partiyê amade nebûn biçine bin barê vê hizrê û dest avêtin piropagendeyan li dijî Sosyalîzma Demokratîk, lewra ji aliyê rêberiya partiyê ve ji wan re hate ragihandin ku ew nikarin endamê partiyê bin û li partiyê hatine derxistin. Çend kesan ji wan jî qinaet kirin û di nav partiyê de man û tekoşîna xwe domandin.

Li pey Kongireya Şeşem û Heftem ku hêdî hêdî di welatên Sosyalîstî û li hemû cîhanê de sosyalîzma heyîn ji bo aliyê hiloşînê ve diçû, paşmayiyên hizr û ramana "Tûde"yî di bêdengiyê de mabûn û xwediyê tekoşîneke wisan nebûn, lê taqimekê ku destebendî ji bo wan bibû çand û kultur, dest avêtin bi birina kesên bê dîsîplîn û karneker û berdewam mijûlê komkirina kesên bêdîsîplîn û bêxîret li derdora xwe bûn û her kesek ku ji aliyê partiyê ve bi her sedemekê dihatin cezakirin, pêwendî jêre digirtin û bi taqima xwe zêde dikirin û ew rewşe heta dihat bihêztir dibû û ji aliyê kesanekê ve birêve diçû ku li Deftera Siyasî û Komîteya Navendî de berpirsiyarî hebûn û di vê derheqê de bêdîsîplînî û karnekirin di bin serê van berpirsane de rû ji berfirehbûnê bû û roj bo rojê usûl û nezm wateya xwe ji dest didan û partî ji bo aliyê Anarşîzmê ve dibir.

Di wê demê de bû ku Dr. Qasimlo daxwaz ji vê bandê kir ku dest ji wan karane berdin, lê bêsûd û fayde bû. Lewra Dr. Qasimlo gihîşte vê encamê ku di kongireya heştem de çareseriyekê ji bo vê pirsgirêkê peyda bike û ji bo vê meremê jî bi şêwirîn tevî çend hevalên Deftera Siyasî biryar dan ku di Kongireya Heştem de hilbijartina endamên rêberiyê li gor lîsteyeke fîks "sabit" be, wate her aliyek lîsteyek fîks bide û xelk ji lîst re deng bide. Vê pêşniyarê di nav endamên rêberiyê de alîgir û dijberên xwe hebû, lê Dr. Qasimlo li ser hilbijartin bi awayê lîsteya fîks biîsrar bû.

Banda navhatî bi xwe ketin û di Komîteya Navendî û komîteyên bajaran de ji rêya deste û hevbîrên xwe ve û hewl dan ku zêdetirîn alîgirên xwe bibin kongirê û di dawiyê de piştî birêveçûna konferansên bajarên Kurdistanê û derdora wan deftera siyasî ji bo hilbijartina nûneran bo kongirê, Kongireya Heştem di roja 28'ê Befranbara 1366 (1987)'an de, li bajarê Silêmaniyê dest bi xebatên xwe kir. Komîsyonên pêwendîdar bi îdarekirina kongireyê hatin diyarîkirin. Kongireyê piştî 5 rojan, di roja 2'ê Befranbarê (salroja damezrandina Komara Kurdistanê) dawî bi karên xwe anî. Beşa yekem a karê kongirê deng wergirtin ji bo rewatî û meşrûbûna kongirê bû ku bi hevra pişikdaran deng ji meşrûiyeta kongireyê re dan. Derheq Kongireya Heştem û encamên vê ev çend xale ciyê baldan û lênihêrînê ne:

1. Di konferansên beriya Kongireya Heştem de, nûnerên kongireyê bi awayekî demokratîk hatibûn hilbijartin û bi heq nûrerê tim endam û Kadro û Pêşmergeyên partiyê bûn. Tu kesekê jî gazinde ji şêwaza hilbijartina nûneran nekir û rewatiya kongireyê nexiste bin pirsyarê. Ger wiha bû kongireyê him maf û him jî meşrûiyeta biryardanê li ser hemû asteng û pirsgirêkên siyasî, rêxistinî û leşkerî û herwiha li ser guherîn yan neguherîna bername û pêrewa hundirînê hebû.

2. Kongireyê piştî baseke dewlemend û berfireh, bi tevaya dengan rapora Komîteya Navendî pejirand û biryara hewce li ser guherîna hinek ji bendên bername û pêrewa hundirîn da û bi vî awayî yekîtiya siyasî ya partiyê bi tevahî derket.

3. Di kongirê de pêşniyar hat kirin ku ji bo hilbijartina Komîteya Navendî, lîsteya **fîks** hebe. Li ser vê pêşniyarê nûnerên kongirê bi dûr û dirêjî wek alîgir û dijber peyivîn û kongirê bi piraniya dengan, lîsteya "sabit" (fîks) pejirand. Çunkî kongire organa herî bilind ya partiyê ye, bi vî awayî pêşkêşkirina lîsteya **fîks** bi tevahî rewatiya xwe peyda kir.

4. Şeş kes ji endamên berê yên Komîteya Navendî ku navê wan di lîsteya 25 kesî de hatibû, daxwaz kirin ku navê wan di lîsteyê bihê derxistin. Heceta wan eva bû ku çunkî wan li dijî şêwaza hilbijartin bi lîsteya **fîks** deng dane, nabe navê wan di lîste de hebe.

5. Di dawiyê de bi piraniya dengan 19 kes weke endamên Komîteya Navendî û 7 kes wek cîgir hatin hilbijartin.

Vêca bila em bizanin sedema vê çendê ku hinek ji wan kesane li dijî awayê hilbijartin bi lîsteya fîks bûn, çi bû?

Delîla wan kesane eva bû ku goya ew şêwaza hilbijaritnê li dijî demokrasî û pêrewa hundirîn ya partiyê ye, rast nebû. Çunkî ji aliyekê di pêrewa hundirîn de şêwaza hilbijartinê nehatiye diyarîkirin û ji aliyek din ve, kongirê jî wek organa herî bilind mafê wê hindê hebû ku pêrewa hundirîn biguherîne.

Ewa kongire bû ku biryarê dide ku gelo hilbijartin dê bi lîsteya **fîks** be yan bi awayê takekesî, eva nîşan dide ku tu tişteke dijî demokratîk rû nedaye û kongireyê bi piraniya dengan û bi awayekî demokratîk hilbijartin bi awayê lîsteya **fîks** pejirand.

Ya rastî eva ye ku piraniya ewên ku li dijî lîsteya **fîks** rawestan, wisa difikirîn navê wan di lîsteya pêşniyarkirî de nine, dema ku lîste hate pêşkêşkirin, şaş û çewtbûna vê dîtin û nêrînê bi tevahî eyan û eşkere bû.

6. Lîst çawa hat amadekirin?

Di pêşde komîsyona hilbijartinê tevî nûnerên hemû konferansan ku nûner ji bo kongireyê şandibûn, şêwirî û ewan navê hevrêyên xwe ji bo endamên eslî û cîgirên Komîteya Navendî û herwiha bo ravêjkar (şêwirmend)iyê pêşniyar kirin. Piştre hate ragihandin, heke kesek bi awayê takekesî xwe bo Komîteya Navendî berbijar dike, bila navê xwe bide komîsyona hilbijartinê, dûre komîsyona hilbijartinê bi şêwirîn tevî hinek ji endamên birêveber, lîste kemiland û lîstek 25 kesî ji bo Komîteya Navendî amade kir.

Berî kemilandina lîste, Sekreter û çend kes ji endamên Polîtbîroya Partiyê tevî zêdetir ji 10 kes ji endamên berê yên Komîteya Navendî axivîn, bona vê hindê ku endametiya Komîteya Navendî ya nû qebûl kirn. Lê mixabin parek ji wan rewşeke pir aloz û xirab pêk anîn û bi baykotkirinê "Abstraksiyon"

amade nabûn tevî Komîteya Navendî hevkariyê bikin. Heta hinek ji wan piştî qebûlkirinê ji ber givaşa hevalên xwe poşman bûn!

7. Tevî vê çendê jî dîsan komîsyona hilbijartinê bi dirust û hewce zanî ku navê 6 kes ji wan di lîsteyê de ji bo endametiya Komîteya Navendî were pêşniyarkirin, lê wan 6 kesan diyar kirin ku ne amade ne tevî lîstê hevkariyê bikin û piraniya wan jî sipasiya komîsyona hilbijartinê kirin.

8. Kongirê bi piraniya dengan lîste pejirand û yek ji wan hevalan ku bi cuda xwe berbijar kiribû, wek cîgir hat hilbijartin ku eva bi xwe nîşaneyek ji demokratîkbûna şêwaza hilbijartinê bû.

9. Ewên ku li dijî hilbijartin bi awayê lîsteya **fîks** bûn, di rastî de tu hecet û mihaneyek nebûn û negotin jî ku çima ev şêwaze ne baş e. Tenê digotin ku berê di partiyê de awayê hilbijartina takekesî hebûye û ev metode nû ye, lê divêt were gotin ku partiya me di anîne rojeva şêwazên nû yên tekoşîna siyasî û rêxistinî de pêşeng bûye û hemû carekê jî piştî heyamekê ji bo wan kesan ku berê qanih nebibûn, xuya bûye ku ev şêwazên nû çend bi qazancê partiyê bûne. Mînaka van şêwazên nû, anîna Sosyalîzma Demokratîk di Kongireya Şeşem de bû ku piraniya ev kesane ku li dijî lîsteya **fîks** bûn, wê demê jî li dijî diyarîkirina Sosyalîzma Demokratîk wek armanca pêşeroj ya partiyê bûn û niha xuya dibe ku anîna Sosyalîzma Demokratîk çend pêşkevtî û serdemiyane bûye ku vê demê jê netêdigehîştin.

10. Anîna lîsteya **fîks** di zirûfekê de bû ku nakokî û dijhevî di Komîteya Navendî de li ser bêkarî û karnekirin û xemsarî û nan bi qerdan û bêdîsîplîniyê ji aliyekê, karkirina zaf û usûlîbûn û parastina qanûn û dîsîplînê ji aliyekî din bû. Di rewşa hesas weke rewşa vê demê de, partiyeke şoreşger weke PDK Îranê nedikarî ku demokrasiya dîsîplînî, nermbûn û usûlîbûn bihev re birêve neçin. Rastî eva ye ku di vê demê de bi sedema eniyek ji endamên Komîteya Navendî pêk hatibû û endamên bêşol û xemsar û derfetperest di bin baskê xwe de kom kiribûn û bibû sedema bê dîsîplînî û dilsariya zaf ji hevrêyan û hevkarî pir dijwar bû. Anîna lîsteya **fîks** di vê demê de dibû sedema vê çendê ku di kongirê de kesanek ji bo endametiya Komîteya Navendî werin hilbijartin ku hetanî qasekê hevahengî û hevkarî di navbera wan de hebe û amade bibin ku berpirsiyariyan li stû bigirin. Diyare ku merem ji hevahengiyê eva nebû ku endamên Komîteya Navendî li ser hemû arîşeyan yek nêrîn û yek deng bin. Berevajî, di Komîteya Navendî de nêrînên cuda û dijberiya hizr û ramanan tişteke rewa ye. Merem ewa bû ku nabe hinek kes dilsoj bin, dîsîplîn hebin, roj heta êvar kar bikin, hinek kes jî xemsar, bêdîsîplîn û bêkar bin. Heta jî vê çendê jî zêdetir bibin sedema belavbûna balnedan û bêdîsîplînî û bêkarî di hemû pêkhateya partiyê de.

11. Her çend di Kongireya Heftem de endamên Komîteya Navendî soz dabûn ku di her ciyekê de ku kar ji wan re were diyarîkirin, dê birêve bibin. Di yekemîn civîna piştî Kongireya Heftem de soza xwe şikandin. Di encam de ji 25 endamên Komîteya Navendî, 19 kes li dora Deftera Siyasî man. Bi tenê çar endam û cîgirên Komîteya Navendî li Fêrgehê niştecih bibûn ku piraniya wan karê pir kêm hebû. (Di vê demê de partiyê 15 komîteyên bajaran hebû ku hewce bû berpirsên wan endamên rêberiyê bin, lewra di kongirê de deng ji wan re hatibû dan). Hebûna lîstê **fîks** di vê demê de ev pirsgirêke jî çareser kir û ewên ku dihatine nav lîstê, berê dizanîn ku ji bo çi kareke hatine hilbijartin û di encam de her kes mijûlê karê diyarîkirî yê xwe bû.

12. Ew çend kesane soz dan ku eger çi nehên nava lîstê, lê amade ne kar bikin, lê piştre bi gotina xwe wefadar neman û dest avêtin piropagendeyan li dijî encamên kongirê û vê demê jî siyaseta me, wate rêberiya hilbijartî ya Kongireya Heştem ji bo liv û tevgeran tevî wan kesan aliyê zaf nermiya bêladan ji usûl û azînan bû ku me ev siyasete jî birêve bir.

Weke hate baskirin, wê bandê dest avête piropagendeyê li dijî kongireya Heştem û bi "cewsazî" (atmosfera neyênî) di çend komîte şaristan û derdora Deftera Siyasî daxwaz kirin ku kongireya awarte were girtin û ev daxwaze di demekê de bû ku çend roj bi ser pêkanîna kongirê de derbas bibû û li gor bername û pêrewê, demekê kongireya awarte dihate girtin ku 2 li ser 3 ya endamên partiyê daxwaz bikin, yan jî pirsgirêkek ji bo Komîteya Navendî derkeve holê ku nekare erkên xwe rêve bibe û daxwaza kongireya awarte bike, ku tu yek ji wan du xalane di holê de nebûn. Ewên ku daxwaza kongireya awarte dikirin, li hember Kadro û Pêşmergeyên Partiyê hejmara wan pir kêm bû û Komîteya Navendî jî dikarî karê xwe bicî bigehîne û tu pirsgirêkek jî di rojevê de nebû, lewra kongireya awarte cihê basê nebû. Piştî heyamekê "cewsazî" û arîşeyan, hêdî hêdî dijebrên kongireya heştem li binkeya Deftera Siyasî bo aliyê bajarê Qeladzê û Raniye şor bûn, ketin rê û nûçeyê civiyana Kekê Hesen Restigar û çend kesên din tevî rêxistina Mucahidîna Recewî hate belavkirin. Ev şayîe di dema berdewambûna kongirê li bajarê Silêmaniyê hebû ku Hesen Restigar û çend kesên din ji hevalên xwe tevî nûnerê Mucahidîn di wî bajarî de civiyabûn û bi vî awayî bi hevkariya Mucahidîn ku li dijî PDK Îranê bû, qirarê cudabûn ji partiyê hate dan û hevrêyên wan yên din yek yek û du du piştî tesfiye hesab ji partiyê bi hêceta derketin ji partiyê bo aliyê bajarên Qeladzê û Raniyê ketin rê û hejmarek ji alîgirên wan jî bi şev direvîn.

Rêberiya partiyê bi sehkirin bi pêşeroja wan kesane hemû cehda xwe ji bo mayîna wan di refên xebata partiyê de da, lê bê sûd û feyde bû. Her çiqas ku çûna wan di zistana sala 1366 (1987)'an de bû, lê rast di roja 01.01.1367 (21.03.1988)'an de, bi ragihandina 10 xalan cudabûna xwe ji partiyê îlan kirin. Di wan 10 xalan de hatibû:

1. Darêtina bingehên usûlî û dijî Împeryalîstî di partiyê de û rakirina siyaset û manorên sazişkirine û rastajoyane ya Feraksiyona Şerefkendî – Qasimlo li hevkirin tevî kom û komeleyên Împeryalîstî û opozîsyona dijî şoreş û girêdayî bi wan.

2. Tekoşîn ji bo damezirandina pêwendiyên dostaniyê tevî welatên Sosyalîstî û pêşkevtinxwaz û xurtkirina pêwendiyan tevî partî û rêxistinên pêşkverûxwaz û hevpêwendî tevî bizavên rizgarîxwaz ên nîştimanî.

3. Pêdagirî li ser domandin û pêşdebirina xebata çekdarane û redkirina siyaseta sazişkarane û gotûbêje li hember rejîma Komara Îslamî, siyasetek ku ji bilî pêkanîna guman û dudiliyê derheq naveroka rejîmê tu encamek nebûye.

4. Piştevanî ji tekoşîna navneteweyî ji bo dawîanîn bi şerê malwêranker yê Îran û Îraq û damezirandina aştiyê di navbera her du welatan li ser bingeha biryara 598'ê ya Konseya Ewlekariyê.

5. Hewildan bo ji nav birina aloziyê di navbera partî û rêxistinên xebatkar û demokrat û şoreşger di asta Îran û Kurdistanê de û tekoşîn ji bo pêkanîna pêwendiya dostaniyê û hevkarî tevî opozîsyona şoreşger li ser bingeha rêzgirtina du aliyane bi merema bihêztirbûna tevgera neteweyî – demokratîk a gelê Kurd û xurtbûna pêwendiya vê bizavê tevî xebata seranserî ji bo hiloşîna rejîma kevneperest û dijî gelî ya Komnara Îslamî û damezirandina rejîmeke demokratîk di Îranê de.

7. Vegerandina usûl û buhayên demokratîk bo nav organên cuda cuda yên partiyê, bi li berçavgirtina maf û parastina pirestîja siyasî û civakî ya endaman û parastina demokrasiyê di navxwe û derveyî welat de.

8. Rakirina çanda kesayetîperestî, xebat li dijî meyl û elaqeya dîktatorî û desthilata takekesî.

9. Hewldan ji bo wergirtina dubare ya wan endam, Kadro û Pêşmergeyan ku bi sedema siyaseta şaş û çewt ya vê Feraksiyonê ji partiyê hatine derxistin yan bêmifah bûne, ev xale wan kesan nagire ku îxanet yan cinayet kiribin.

10. Parastina buhayên mirovhezane bi li berçavgirtina herçiqas bêtir ya usûl û azînên exlaqî û civakî ji bo pêhatina dilsozî û hevpêwendiyên hevalane di hemû organên partiyê de.

PDK Îranê – Rêberya Şoreşger
01.01.1367

Piştî derkirina wan 10 xalane û danîna navê "Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê – Rêberiya Şoreşger" û navên weke navên organên partiyê, bo mînak melbenda Şumal û Hêza Agirî her heman nav bûn. Partiyê ji wan re ragihand ku eger bi naveke din partiya xwe rabigehînin û navê komîte û hêzên xwe biguherînin partî tu astengekê ji wan re çê nake û belku amade ye tevî wan pêwendiyê ava bike. Lê wiha dixuya ku danîna wan navane û herwiha yek yekê wan xalane pir jî bi dest û heza wan nabû, belku eva Mucahidîn bû ku siyaseta ji dijî Partiya Demokrat û xelkê Kurdistanê hebû ku dixwest xortên gelê Kurd li hember hev bike dijber û neyar, weke mercên hevkariyê tevî wan ew navene diyarî kiribûn. Me wê demê zanyariya wê hindê hebû ku Mucahidîn demeke zaf berî kongira 8'ê bi Kekê Hesen Restigar re pêwendî girtiye û soza hevkariyê di vî warî de jê re dabû û di destpêka cudabûnê de bi rêzkirina wan 10 xalane ku ji rastiyê bi dûr bûn ev rastiye dihat dîtin.

Nameya hejmarek ji Kadro û Pêşmergeyên Rêberiya Şoreşger ku di Cozerdana sala 1368 (1989)'an de, ji bo Pêşmerge û rêxistinên siyasî yên Kurdî hatiye nivîsandin, vê rastiya ku qala vê hate kirin bi ron û zelalî diselimîne. Di beşek ji nameya wan Kadro û Pêşmergeyên bi nav Rêberiya Şoreşger de piştî destpêkê hatiye:

1. Bandbazî û destebendî bi awayekî eşkere di nav Rêberiya Şoreşger de tê dîtin û

www.arsivakurdi.org

tu desteyek girûpa din qebûl nake, ew şêwaza çewt û nebicî yê bûye sedema dilsariya Kadro û Pêşmergeyan û bandoreke xirab li ser wan danaye.

2. Di civîna Komîteya Navendî de biryar hatibû dan ku Kadroyên derdora Deftera Siyasî ji bo hundirê welat vegerin û Komîsyona "Teşkîlat"ê birêveberê vê biryarê bû, lê piştî civînê, ji bilî vê hindê ku ev biryare birêve neçû, çend kes ji endamên Deftera Siyasî berevajî biryara Deftera Siyasî lîsteyek dan Komîsyona "Teşkîlat"ê ku navên çend kesan têde bû û daxwaz kiribûn ku ew kesên ku navê wan di vî lîsteyî de ye, neçne bo hundirê welat û bi vî awayî çend kesek di bin baskê xwe de girtin û bi vê hincetê Kadroyek ku li ser biryara pilînomê bi sedema dizî û gendelî (rizirok)ya exlaqî û girêdayîbûn bi ciheke din divêt hatiba cezakirin, nek her nehatiye derkirin, belku niha yê bûye endamê navenda 3'ê.

3. Yek ji wan gazinde û lomeyan ku ji Feraksiyonê hatiye kirin, ewa bûye ku Komîsyona Siyasî – Nîzamî ya Fereksiyonê hinek ji Kadro û Pêşmergeyên partiyê neçar bi derketin û çûn ji partiyê kirine, lê tenê di heyamê wan 15 mehane de zêdetir ji 100 kes ji Kadro û Pêşmergeyên partiyê teslîmê rejîmê bûne, ji partiyê derketine yan vegeriyane bal Feraksiyonê. Bêguman sedema wan guherînane bûna hinek liv û lebata ne şoreşgerane di nav rêberiya me de ye, weke sîxorperwerî, di bin baskgirtina kesên diz û bêexlaq û ...

4. Hejmarek ji sîxorên rêxistinên din bi "belê qurban gotin" û xwe nêzîkkirin bi endamên rêberiyê, xwe zelanbdine nav refên Kadroyên partiyê û êdî niha bi sedema hebûna wan cure kesane Kadro û Pêşmergeyên din li ber çavan winda bûne û nahên dîtin û ...

5. Di destpêkê de Rêberiya Şoreşger ragihand ku hevkariyên Mucahidîn bi vê rêxistinê re bê şert û merc in, lê niha derdikeve ku ev arîkariyane bi van mercan ji Rêberiya Şoreşger re tên dan:

A. Danenasîna Feraksiyonê bi gotûbêjxwaz. B. Piropagende bi dijî şexsê Dr. Qasimlo. C. Bi îsrarbûn li ser navê Partiya Demokrat û neguherîna wî navî û çend mercên din ku em dê di demeke din dê bas bikin.

Eva beşek ji nameya Kadro û Pêşmergeyên berê yên PDK Îranê – Rêberiya Şoreşger bû ku di Cuzerdana 1368 (1989)'an de, yanî 15 mehan piştî cudabûna wan ji partiyê hatiye belavkirin.

Xwenerê hêja!

Herçend ku ez vê nameyê ji bo bersivdan bi wan 10 xalên rêzkirî yên Rêberiya Şoreşger (Lader) bi pêwîst û baş dizanim, lê bersiva çend xalên wan her çend bi kurtî jî be bi hewce dizanim.

Di daxuyaniya xwe ya 10 xalî de, yekem derew eva ye ku goya wan yanî 15 kesan, Partiya Demokrat derxistiye. Li kuderê der kirine û çawa? Diyar nine! Bo hêcet peydakirin ji bo vî karê xwe. Partiya Demokrat bi dehan hezar Kadro û Pêşmergeyan bi Feraksiyon binav kirin û navê xwe jî bi hejmarek pir kêm weke Partiya Demokrat dihesibandin û taze Rêberiya Şoreşger jî weke paşgir li dû xwe re dikêşin, carê di diyarîkirina nav de tenê rêberiyê bi şoreşger dihesibînin û Kadro û Pêşmergeyên ku tevî wan çûne weke şoreşger nazanin ku eva bi xwe jî balkêş e!

Lê ya rast ava ye ku ew rêberiyekî şoreşvan nebûn, belkî komek mirovên qazancxwaz û desthilatperest bûn ku ji ber qazanc û berjewendiyên xwe ji partiyê cuda bûn û xelkê navê "Lader" li ser wan danî û ev nave niha jî vê bûye pênaseya wan.

Rexneya Rêberiya Şoreşger ji Partiya Demokart eva bû ku tevî Sosyal Demokrasiyê dostaniyê dike, eva di demekê de bû ku Enternasiyonala Sosyalîst wê demê zêdetir ji 100 endam û alîgiran hebû, ji nûnerên partiyê bi germî pêşwazî dikir û heta li ser pêşniyara partiyê belgeyeke erênî û heta wê demê bê mînak li ser pirsgirêka Kurd pesend kiribû.

"Rêberiya Şoreşger" di hejmara 6 a rojnameya xwe de rûmet û şanaziyê bi vê hindê dikir ku çûne ber deriyê Partiya Sosyal Demokrat a Swêdê û karmendeke biçûk yê wê partiyê amade bûye tevî wan biaxive! Ev ji kîderê û ewa wan li kîderê?

Ji ber xweşreqisînê ji bo Mucahidînan, di daxuyaniya xwe de anîne ku Partiya Demokrat sazişkar û gotûbêjxwaz e. Partiya Demokart tu caran ne veşartiye û herdem li ser vê baweriyê bûye ku doza Kurd, ji rêya leşkerî ve nahê çareserkirin û di dawiyê de madam ku dirûşmên me di çarçoveya Îranê de ne, divêt pirsa Kurd bi diyalog were çareserkirin û tevî her rejîmeke demokratîk ku di pêşeroja Îranê de pêk bihê, di çarçoveya xwastekên Kurd de ku di bernameya partiya me de hatine diyarîkirin, dê bikevine gotûbêjê. Lê xweşxizmetiya Rêberiya Şoreşger zêdetir vê demê derdikeve holê û eşkere dibe ku heke ev benda sepandî ya Mucahidîn bi ser van de ne ba, bi xwe baş dizanin ku di benda 10 û 11'an ya biryarnameya pesendkirî di kongira 8'em derheq rikeberî û xebat li dijî rejîmê de hatiye:

Benda 10: Di çarçoveya rejîma Melayan de tu yek ji daxwazên sereke yên xelkê Kurdistanê, yanî Demokrasî ji bo Îranê û Otonomî ji bo Kurdistanê nahên dîtin, lewra dirûşma partiyê pêkhatiye ji hiloşîna vê rejîmê û anîna serkar ya rejîmeke demokratîk her li ser ciyê xwe de ye.

Benda 11: Xebata çekdarane şêwaza eslî ji bo hiloşandina rejîmê ye, lê geşandina hemû şêwazên xebatê û girêdana wan bi xebata çekdarane, hiloşîna rejîmê amadetir dike.

Xwendevanê hêja! Kîjan ji wan du bendane heza sazişkarane tevî rejîmê tê de ye, ji bilî xweşreqsîn û xweşxizmetî ya Rêberiya Şoreşger bo Mucahidîna Recewî nebe, taze ji bilî wan îdeayane di dawiyê de xuya bû ku her vê Rêberiya Şoreşger di yek ji bajarên Kurdistana Îraqê de tevî nûnerê rejîmê gotûbêj kiriye ku piştre jî îtiraf bi vî karî kir.

Di vê daxuyanê de hatiye ku di Partiya Demokrat de demokrasî tune ye, hatina vê hevokê di demekê de ye ku bi xwe jî baş dizanin ku heke rêxistinek di Îran û Kurdistanê de hebe ku usûlên demokrasiyê parastibe, her Partiya Demokrat e. Heke partiyê rêz ji demokrasiyê re negirtiba gelo ewan dikarî wiha bi hêsanî bandbaziyê bikin û dekan ji Kadro û Pêşmergeyan bikin (bixapînin). Di rastiyê de ewan mifaheke xirab ji hebûna demokarsiyê girtin, lê yan divêt mirov demokrat nebe yan jî divêt buhayên vê demokrasiyê bide. Di vê rewşê de mirov divêt çi bihayekê ji gotinên xwe re danê ku bawerê bike di Partiya Demokart de dîktatorî heye û penahê ji bo Mucahidîna bibe ku goya rêzê ji demokarasiyê digire?!

Rexneya Rêberiya Şoreşger ji PDK Îranê ewa bû ku di partiyê de çanda şexsiyetperestiyê heye, serdestekên wan baş dizanin ku di partiyê de kultura şexsiyekperestiyê tu cihek tune ye, eva ew bûn ku bi pesna Dr. Qasimlo yê nemir dixwastin takekesperestiyê di parityê de xurt û bihêz bikin. Pirsyar eva ye ku gelo hetanî niha di nav partiyê de tu caran dirûşma Qasimlo û Kurdistan hatiye dan? Meger di dema çûna Taqima Heft Kesî ku Dr. Qasimlo ji bo xelkê Mehabadê diaxivî, dirûşma "**bijî Qasimlo**" nagotin û her Dr. Qasimlo nebû ku ji xelkê hate cihab û got ewa ne dirûşma Partiya Demokrat e, dirûşma partiyê "**bijî Demokrat**" e. Yan di vî heyamî de rêberê mezin yê gelê me bi ew hemû xweştevîbûna ku di nav xelk û refên partiyê de hebû kengî izn da ku heta yek wêneyê wî di xwenîşandan yan di oda kar ya hevalên partiyê de hatibe helawîstin. Niha jî em dibînin ku wêneyê Masûd Recewî di mala biraderên Rêberiya Şoreşger de hatiye helawîstin. Lewra ev îdeaya wan jî bênaverok û pûç bû û xelk pê dikenîn û henek pê dikirin.

Dr. Qasimloyê mezin di sala 1352 (1973)'an heta sala 1368 (1989)'an yanî dema şehîdbûna wî, 6 geran Sekreterê Giştî yê partiyê bûye û di her şeş geran di destpêkê de bi dengê endamên kongirê bûye, Endamê Komîteya Navendî û li Komîteya Navendî bi dengê endamên Komîteya Navendî weke Sekreter hatiye hilbijartin.

Axayê Recewî ku wêneyên wî bi dirêjahiya çend metran di xwenîşandanan de tên hilgirtin û dirûşma Recewiyê Îranê û Îrana Recewî guhê mirov ker dikir, rêberê heta hetayî û bê rikeber yê Mucahidîn, bila keremke û bibêje ku di kîjan kongirê de hatiye hilbijartin ku Rêberiya Şoreşger penah bo birin? Birano we kîjan rexneya biçûk di vî warî de ji wî girt?!

Xaleke din di daxuyaniya 10 xalî ya wan "Hewildan ji bi pêwendiya dostaniyê tevî welatên sosyalîstî ye", hêviyek ku di heyama tekoşîna siyasî ya xwe de negihîştinê û weke evîndareke yek aliyane her bi vê hêviyê man. Nezaniya Rêberiya Şoreşger her di vê de bû ku welatên sosyalîstî bi xwe tûşî kirîzeke wiha bibûn ku yek li pey yekê dihiloşîn û rexne ji derbasbûyiya xwe digirtin.

Mîxaîl Gurbaçof di vê derheqê de, li meha Sermaweza 1366 (1987)'an, ragihand: "Em evro tenê bi merca aliyê zaf yê tekoşîna azad ya takekesan pêşvebirina herçiqas bêtir ya awayên demokratîk, ku ji taybetmendiyên sosyalîzmê ne, dikarin bizava ber bi geşekirinê ya xwe bibin pêş. Naveroka siyaseta partiya me li dora berfirehkirin û xurtkirina her çiqas bêtir ya beşdariya xelkê di kar û barên welat de dizivire".

Gurbaçof dibêje: "Demokrasî bi qasê hewa ji me re hewce ye" û di dema gotinên xwe de dibêje: "Demekê ku em demokrasiya sosyalîstî bihêz û xurt dikin û dibin pêş, karînên wê nîşan didin, bo xwe parastin ji dubarebûna şaşî û çewtiyên berê me girîgtirîn ewleyî pêk aniye".

Lê Rêberiya Şoreşger her bi vê hêviyê bûn ku welatên sosyalîstî deriyekê ji wan re vekin û haydarê van guherîn û hiloşînane nebûn û diyar nebû ku di çi xewekê de bûn.

**Wergerandin bo Kurmancî: Omîd Esxeran**

www.arsivakurd.org

# Daxuyaniya Sekretariyeta PDK Îranê Bi Hinceta Wexera Dawiyê Ya Pirofesor Şekroyê Xudo



Mixabin xebera wexera dawiyê ya dîroknas, zimanzan û tekoşerê çanda Kurdî pirofesor Şekroyê Xudo, di temenê 77 saliyê de li bajarê Moskovayê gihîşte destê me. Pirofesorê nemir xizmeteke hêja ji çand û zimanê Kurdî re kir û weke kesayetiyeke zanistî û akademîk di gelek civîn û komcivînên zanistî di asta navneteweyî de ji bo nasandina doza berheq a gelê Kurd beşdarî kir û hewil da. Ji rehmetiyê Şekroyê Xudo, 20 pirtûkên dewlemend bicih mane.

Em bi hinceta ji destçûna pirofesor Şekroyê Xudo, hevdem tevî derbirîna xem û keserên xwe, serxweşiyê pêşkêşî malbata wî ya birûmet û tev heval û hogirên wî dikin û ji destçûna wî pirofesorî, xisar û zirareke mezin ji neteweya Kurd re dibînin.

**Riha wî şad û cihê wî bihişta berîn be.**
**Sekretariya PDK Îranê**

# Kesayetiyê Navdar Yê Kurd, Profesor Şekroyê Xudo Li Moskovayê Wefat Kir

Roja 01.02.2007'an, dîroknas, zimanzan û xebatkarê ziman û çanda Kurdî, profesor Şekroyê Xudo di temenê 77 saliya xwe de li bajarê Moskovayê koça dawiyê kir.

Profesorê nemir Şekroyê Xudo, gelek xizmetên mezin û berçav ji çand û ziman û doza Kurd re kirine û weke kesayetiyek zanistî û akademîk pir hewl û xebat û xizmet bi gelê xwe kirine. Ew xwediyê 20 pirtûkên dewlemend e.

Em bi hinceta vê kul û xema giran behî û sersaxiya xwe bona wefata profesor û kesayetiyê akademîk yê Kurd Şekroyê Xudo, pêşkêşî malbata wî û gelê Kurd dikin û xwe di kul û xema wan de şirîk û hevxem dizanin.

Di roja 02.02.2007'an de, termê pîroz yê profesor Şekroyê Xudo ji bo Ermenistanê hate birin û piştî rê û resmeke fermî ya dewlet û akademîk ya berfireh ji bo veşartinê ber bi gundê Elegez a Ermenistanê hate şandin.

**Malbata weşanê ya Agirî**
**03.02.2007**

# Gerek Kurt Di Dîrokê De ...

**Amadekar: Nûredîn Sofîzade**

**01.02.1997:** Piştî serhildana gelên Îranê û sernixûniya rejîma Şah di Îranê de, "Xumeynî" ji welatê Fransayê re vergeriya Îranê û bi xapandina xelkê karî desthilatê bi destve bigre.
**01.02.2004:** Teqîna mayînan li melbenda 1'ê a YNK'ê û Tayê 2'ê a PDK'ê li bajarê Hewlêrê ji aliyê terorîstan ve di roja Cejna Qurbanê de bû sebebê şehîdbûna pitir ji 100 kes ji endamên rêberiya her du partiyan û berpirsên hukumetî weke şehîd **Samî Ebdulrehman** û xelkê sivîl yê din.
**02.02.2007:** PDK Îranê weke nûnerê neteweya Kurd li Kurdistana Îranê, di Rêxistina Neteweyên Bênûner anku "UNPO"yê de hate wergirtinê.
**03.02.1982:** Kuştina bi dehan kes ji xelkê bêberevan a Serçinarê ji aliyê hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê.

**04.02.1949:** Mihemed Riza Şah li cejna salvegera vekirina zanîngehê di Tehranê de dikeve ber êrîşa guleyan û bi sivikî birîndar dibe.
**05.02.1949:** Hozanvana bi nav û deng a netewa Kurd **Eyşeşan** koça dawiyê kir. Wê xatûna stiranbêj roleke mezin li ser vejandina muzîka Kurdî leîst û çendîn berhem piştî xwe bi cî hêlan ku niha jî keçên Kurd weke sembola çavkaniya hunera jinên Kurd mifahê jê werdigirin.

**08.02.1979:** Komîteya Navendî a PDK Îranê bi şandina nameyeke dostane û birayane bo "Xumeynî", daxwazên neteweya Kurd anîn holê. Herwiha di vê nameyê de îşare bi vê çendê jî hatibû kirin ku nabe destkevtên serhildana gelên Îranê tenê ji aliyê taqimeke diyarîkirî ve were qorixkirinê.
**08.02.2005:** Belavbûna pirogramên Radyo **Dengê Kurdistana Îranê** li ser setelaytê kanal "GBTS - 1" di beşa radyoyan de.

**08.02.1914:** Çap û weşandina kovara **Banga Kurd** li bajarê Bexdayê.
**09.02.1953:** Serhildana cotkarên devera "Mukiryan" a bajarê Mehabadê li dijî zilm û zordariya beg û axayan li derheq xebatkarên PDK Îranê. Ev serhildane bi hevkariya hêzên rejîma Şah ve hate tepeserkirin.
**10.02.1829:** Îmzakirina peymannameya "Turkemençay" a di navbera welatê Îran û Soviyeta berê de.
**11.02.1979:** Serkevtina şoreşa gelên Îranê û sernixûniya rejîma 2500 saliya Paşayetiyê di vî welatî de.
**11.02.2006:** Endamê Serokatiyê ya Partiya Welatparêzên Demokrat **Kanî Yîlmaz** li bajarê Silêmaniyê de hate terorkirinê. Ev Kurdê Bakûrê Kurdistanê û berê endamê rêveberiya PKK'ê bû.
**13.02.1967:** Helbestvanê mezin û navdar ê Îranê "Ferox Feroxzad" koça dawiyê kir.
**13.02.2005:** Yekîtiya Xwendekarên Demokrat a Kurdistana Îranê weke rêxistineke sivîl a ser bi PDK Îranê hate damezirandin.

**14.02.1989:** Dana Fitwaya kuştina nivîskarê Birîtaniyayî bi navê **Selman Roşdî** ji aliyê "Xumeynî" ve, bi sûça nivîsandina pirtûka "Ayetên Şeytanî".
**14.02.2005:** Di kiryareke terorîstî li welatê Lubnanê de, Serok Wezîrê berê yê vî welatî **Refîq Herîrî** hate kuştin. Piştî lêkolînê û li gor belgeyên bi destvehatî, eşkere bû ku dewleta Sûriyê di vê terorê de dest hebû.
**15.02.1999:** Ebdula Ocalan, Serokê PKK'ê di welatê Kîniyayê de ji aliyê Mîta rejîma Turkiyê ve hate girtin û ber bi Turkiyê hate şandin.

**15.02.2000:** Hunermendê mezin û dengbêjê bi nav û deng yê netewa Kurd **Îbrahîm Newrozî** koça dawiyê kir. Navhatî ku bi **Birê** dihate naskirinê. Bi dehan berhemên bi dengê xweş û zelal yê xwe bo netewa Kurd bi cî hêla. Îbrahîm Newrozî herwiha di beşa Kurdî ya Radyoya Urmiyê û Kirmaşanê de jî xebitiye û mirovekî şoreşvan bû û çend salan jî di refa Pêşmergeyên PDK Îranê de bûye.
**15.02:2006:** Xelkê bajarê Makû, Yolegeldî, Şût û Bazirganê li dema birêvebirina meşeke qanûnî û aştîxwazane, dikevine ber êrîşa hovane ya hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê û mixabin 14 kes ji welatiyên Kurd tên şehîdkirinê.

www.arsivakurdi.org

# Gavek Din Ya Paşverû

Ez dixwazim di vê nivîsarê de li ser kompiloya beşkirina xwendinê di Zanîngehên Îranê li ser bingeha zayendê di navbera keç û kuran rabivestim, kompiloyek ku ji aliyê nûnerên Meclîsa Şêwra Îslamî ya Îranê (Parleman) de hate berbas û tevî nerazîbûneke zaf, hem ji aliyê raya giştî li Îranê û nemaze jinan û hem ji aliyê çend kes ji nûnerên Meclisa Îslamî berbirû bû.

Divêt berî her tiştî îşare bi vê çendê were kirinê ku rejîma Îranê her li destpêka bidestve girtina desthilatê di Îranê de, bi pêkanîna asteng û pirsgirêkan bo gişt jin û keçên Îranê, xwestiye ku rola wan di civakê de kêmreng bike. Her çend ku di destpêka desthilatdariya xwe de karî heya asteke zaf serkeve, lê wê siyasetê nekarî bêtir bidome û jinên xebatkar û azadîxwaz yên Îranê ji rêya xwendin û perwerdekirina xwe karîn vê rejîmê di gelek waran de neçar bi pêşvekişandinê bike.

Ger em lênihêrîneké li ser hejmara şagird û xwendekarên jin û keç di salên piştî hatine ser şola rejîmê bikin, ji me re eşkere dibe ku astê xwendina wan ber bi zêdebûnê çûye û ev yeka bûye sebebê pişikdariya zêdetir a jin û keçan di bazara kar de. Bo mînak li gor çavkaniyan, hejmara jinên şagird û xwendekar bi nisbet giştî nifûsa Îranê a jordeyî 10 saliyê, ji %15 di sala 1976’an bo %17 di sala 1986’an, %22 di sala 1991’an û %27 di sala 1996’an, gihîştiye û îro rojê pitir ji %60 ya pêkhateya xwendekarên zanîngehên Îranê jin in.(1)

Lewra vê yekê desthilatdarên rejîma Îranê xistiye nigeranî û tirsê û vê kerê jî dixwaze di rêya beşkirina xwendinê di zanîngehên Îranê de a di navbera keç û kuran de ber bi pêşveçûna vê pêvajoyê rabiwestin.

Bi nav nûnerên Meclisa Şêwra Îslamî ya Îranê li ciyê pêşkêşkirina gelaleyên aborî û mikumbûn li ser cî bi cî kirina wan, ku nebûna wan projeyan yek ji sebebên herî bingehîn yên zêdebûna bêkarî, îtiyad, îdz, xizanî, fehşa, hilatina mêjiyan, ji hev veqetiyan û ... di Îranê de ye, bi hilbijartina rêyeke neserrast û nedirust bi hizra xwe dê bikare pêşiya hindek ji wan pirsane weke zêdebûna daxwaza cudabûna jin û mêran di malbatan de yan jordeçûna astê temenê zewicîna jinan di Îranê de bigre, çimku kesên ku terhên han pêşkêşî Meclîsê dikin, li ser vê baweriyê ne ku jordeçûna astê xwendina jinan yê bûye sebebê pêkhatina pirsên han!.

Lê bi rastî zanist û perwerdehiya jinan yê bûye sebebê pêkhatina pirsên han, yan nebûna dewleteke demokratîk û berpirs ku hemû samana netewî a xelkê Îranê bona kirîna çek û alavên leşkerî, hevkarîkirin tevî girûpên terorîstî di welatên weke Îraq, Lubnan, Filistîn, Efxanistan, Sûdan, Erebistana Seûdî û zaf welatên din ji bo neewlekirina van welatan, yan dewlemenkirina Uraniyomê û xebat ji bo bidestveanîna çekên etomî ku bi milyar dolaran di vê rêyê de tê xerckirin, bûye sebebê çêbûna pirsên navhatî.

Bi nav nûnerên xelkê Îranê di Meclîsa

**Hemîd Muxtarî**



Îslamî de bi dana vê gelaleyê carek din dijberiya xwe tevî zanist û pêşkevtinê di Îranê de û bê bihakirina mêjiyên û mirovên pispor, akademîk û xwedî şiyan ku karîne bi cehd û tekoşîna xwe ber bi zanîngehê herin, nîşan dan.

Bi giştî îdeolojî û bingeha desthilatdarên rejîma Îranê derheq jinan eva ye ku ew dibêjin erkên sereke yên jinan, maldarî, çêkirin û xwedîkirina zarokan û wd...e, lê pişikdariya wan di bazara kar de di qonaxa paşîn de ye. Lewra her di destpêka desthilatdariya xwe de, siyasetên dijî jinan bi kar anîn û li dehsala 80’an a Zayînî (dehsala 60’an ya Rojî) piştre xebat kir ku ew destkevtinên jinan ên du dehsalên berê ku bi xebat û tekoşîna xwe bidestve anîbûn, ji wan bistîne û tenê di warê perwerde û tendurustiyê de ku ew jî bo siyaseta cudahiya regezî û zayendî ji aliyê rejîmê ve zaf girîng bû, îzna pişikdariyê bide wan. Di hemû warên din de rejîma Îslamî di qanûn û kiryarên xwe de cehd kiriye ku jinan di bazara kar de dûr bixe û yek ji rêyên dûrxistina wan di bazara kar de, pêşîgirtina wan ji çûn di nava zanîngehan de û kêmkirina astê xwendinê û perwerdehiya wan di civakê de ye. Çimku keç û jinên nexwendewar û bêşiyan nikarin di civakê de xwedî çalakî û ektîv bin û di warê aborî ve serbixweyî hebin. Herwisa ji aliyeke din ve jî, jinên xwendewar nikarin her terze kareké ku bi dilê wan be, ji xwe re hilbijêrin û tenê çend karek di civakê de bona jinan hatine diyarîkirin û karên girîng û bibandor weke xebat û çalakiyên siyasî, rêveberiyên leşkerî, Serok Komar, dadwer û zaf karên din ku bi giştî mêranê tên hesibandin, bandoreke zaf girîng li ser dûrxistina jinan ji bazara kar û serxwebûna wan di warê aborî de daniye, çimku karên ku di rejîma Îranê de taybet ji bo mêran in, ev kar in ku xwediyê asta herî bilind ya rêzjêgirtin, desthilat û pere ye.

Li vir pirsyarek tê holê: Erê gelo, bi rastî jineke xwendewar dikare dayîkeke baş bo zarokên xwe be, yan dayîkeke ne xwendewar?! Bersiv rohn û eşkere ye, bê şik û guman xwendina jinan dibe sebebê vê ku zarokên xwe bi başî perwerde bikin û bispêrne civakê, da ku bikarin xizmetê ji civaka xwe re bikin û jiyan û civaka xwe ber bi nûjenbûn û pêşveçûnê bibin.

Di dawiyê de divê em bibêjin ku binav nûnerên Meclîsa Şêwra Îslamî ya Îranê ger bixwazin ev terhê di Şêwra Îslamî de bipejirînin, bê şik dê tevî nerazîbûneke giştî ji aliyê gişt xelkê azadîxwaz yên Îranê û civaka navneteweyî berbirû be û zêdetir ji aliyê raya giştî a cîhanê dê were dûrxistinê.

**Jêder:**

**1. malpera “irwomen”**

# Lihevkirina YE’ê Li Dor Birêvebirina Hisarên Li Ser Îranê

Wezîrên Derve yên welatên endam di Yekîtiya Ewropayê de lihevhatin ku ambarbûyiyên aborî yên pejirandiyê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî dijî Îranê ji ber nesekinandina xebatên mehandina Uraniyûmê bixin warê pratîkê.

Wan di rûniştina roja duşemî li Birûksela Paytexta Beljîkayê de cezayên li gorî biryarnameya 1737’an ya Konseya Ewlekariya NY’ê bi fermî pejirandin.

Biryaranameya han li Desambera borî de hate erêkirin û li gor wê firotina her terze kereste û alavên teknîkî bi Îranê ku dikare li programên Etomî û mûşekî de bimifah be, hate qedexekirinê. Ceza herwiha destbisergirtina saman û sermaya 10 kompanî û welatiyên Îranî jî bi xwe ve digire.



Di vê rûniştinê de herweha gihîştine vê encamê, ger ku Îran dest ji mehandina Uraniyûmê berde, YE’ê dê dirêjî bi haydan û îmtiyazên aborî yên pêtir bo Îranê bide.

# HEVPEYVÎNEK LI SER REWŞA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ, BI EVDILE KOÇER RE

**Hevpeyvîn: Letîf Epozdemir**

**Evdile Koçer kî ye?**
**Di sala 1977'an de li Sêrtê hatiye dinyayê.**
**Zanîngeha Anadolu beşa 'Kamu' di nîvî de hişt.**
**Li Swêdê li Ûnîversîteya Uppsalayê li ser ziman û wêjeya kurdî heyamekê ders wergirt.**
**Gelek nivîs û çîrokên wî di kovar û rojnameyên kurdî yên wekî Jiyana Rewşen, Pîne, Azadiya Welat, Nûdem, Hîwa, Tîroj, Kovara W, de derketin.**
**Nivîs û çîrokên wî li gelek cihan bûn şano û kurteleyîstik.**
**Pirtûkên wî:**
**Govendistan (Weşanên Pêrî-2002)**
**Mirin (Weşanên Aram - 2006)**

## "EDEBIYAT AN JÎ BERHEMEKE HUNERÎ DI DU SÊ ROJAN DE ŞÎN NABE"


**Rewşa Edebiyata Kurdî, îro beramber bi salên 80'î çavane. Li Turkiyê ku şertên nivîsandina bi Kurdî pariyek azad bûne, çi fersend daye pêşketina edebiyatê. Gelo em dikarin bêjin ku xwendin û nivîsandin yekser dimeşin yan na..?**

Erê rewş îro gelekî baştir e, berî 20 salan peyveke kurdî ji gelek kesan re dibû goristan. Lê îro entelîjensiya kurd hêj di nava haleke sersar de qelema xwe dilebitîne, tu dibêjî qey çavê li qanûn û deriyên Enqereyê dê tu carî neqerime. Edebiyat an jî berhemeke hunerî di du sê rojan de şîn nabe û bi çar gulan jî bihar nayê, divê dildarên kurdî bi şev û roj xepara erdanivîs û hunerê ya beyar bikin. Heke ev xepartî bi rêk û pêk û li gorî disîplîna hunera dinyayê bidome, civaka me jî dê bikaribe rojekê pala xwe bide bexçeyê huner û edebiyata xwe û jê bitamije.

Heke qesta te civaka me be, ji xwe nifşên nû weke ku bi taya mirinê ketibin her ji xwe ji hebûna xwe dûr dikeve û xwe li ber zimanên din şêrîntir dikin, heq ew bû ku nifşên nûhatî bi ser me nivîskaran de her biqêriyan da ku me berhemên baştir bihûnandina. Lê heke qesta te xwendin û nivîsandina nivîskar an jî nivîsevanên kurdî be. Ez bawer nakim ku bi hev re bimeşin. Ji xwe dema ku meriv ji hinek nivîskaran dipirse, ji zikê xwe têr in û pozê xwe li xwendinê xwar dikin. Psîkolojiyeka wiha xerîb li ser wan heye ku, tu dibêjî qey dibêjin, "Me xwendinê xetimandiye, pêdiviya me êdî pê tune, em êdî nivîskar in..." Lê ya rastî nivîsandin zaroka xwendinê ye, bêyî xwendinên jidil û bieşq ew zarok -yanî nivîs- seqet tê dinyayê û dikeve ser rûyê rojname kovar û pirtûkan.

## "BI ZOR Û DEHFDANÊ NE KURDÎTÎ ÇÊDIBE Û NE JÎ HÛŞIYÊN GOTINAN ÊN HUNER Û EDEBIYATÊ DIGIHIN. "

**Di dîrokê de gelek caran rewşenbîrên Kurd bi sedema şert û zirûfên nexweş, neçar mane ku koçebar bibin û herne derveyî welêt. Herwiha li derveyî welêt berhemên**



**xwe amade kirine. Edebiyat di salên dijwariyê de li derve xwe parastiye. Sirgûn û xerîbî çi bandorek daniye ser edebiyata Kurdî?**

Sirgûn û xerîbî helbet feydeyek pir mezin daye edebiyata kurdî ya modern, ku zimanê nivîsînê bi ser xwe ve were û ji gulebarandina asîmîlasyona serdestên Kurdistanê xilas bibe.

Sirgûnî berî her tiştî dike ku meriv fêrî ziman edebiyat û kulturên din bibe û dike ku meriv bi vî awayî gelek sembol motîf û metaforan bide ber hev û bi rêya edebiyatê veguhêzîne ser bedena civaka xwe. Heke meriv xerîbiyê ji xwe re neke goristanek, dikare ji civaka xwe re bike deriyê gotinên biriqî.

Lê wisa xuya dike ku kurdan baş sûd ji xerîbî û sirgûniyê wernegirtin. Me tevan bi çavê serê xwe dît ku dema pereyê hin kesan hate birîn dev ji nivîsa kurdî berdan. Yanî bi zor û dehfdanê ne kurdîtî çêdibe û ne jî hûşiyên gotinan ên huner û edebiyatê digihin.

**Îro jî navenda edebiyatê xerîbiye yan êdî edebiyat dikare li ser axa xwe şîn bibe. Nîvîskarên Kurd hewceye çi bikin ku edebiyat zêdetir li ser axa xwe xûrt bibe.?**

Ev deh sal e jî edebiyat li ser xaka xwe yanî li welêt şîn dibe. Vebûna hin navendên rojname û çand û hunerê li Bakûr îşaretên xêrê ne. Lê ya rastî bi haleke pir trajîkomîk ve edebiyata me şîn dibe. Wisa bi dileke sar û bi helwestên pasîv ve huner û edebiyat pêş nakeve. Mesela helbestek çima di qehwexaneyeke Amed, Sêrtê de nayê xwendin ez hê jî fêm nakim, çima şanoyek li ser tenûra kurdan nayê lîstin. Û pirsa herî girîng ev e: Çima hunermend û nivîskarên kurd dimînin li benda îktîdara dewletê û îktîdara belediyeyan? Helbet wezîfeya belediyan e ku peyva kurdî li her derî şîn bikin, lê heke ev çênebe jî heqê hunermendan tune ku li benda ti "xweda"yî bisekinin.

## "DENGBÊJ PIRTÛKXANEYÊN KURDAN ÊN VEŞARTÎNE"

**Dengbêjî, xalek gelek giring e di edebiyatê de. Herwiha edebiyata Kurdî ya devokî dengbêjiyê rumetek bilind hesab dike. Gelo Dengbêjên Kurd hetanî îro çi xizmet dane Edebiyatê?**

Ji xwe tê zanîn ku dengbêj pirtûkxaneyên kurdan ên veşartîne. Ji bo hunera kurdan a modern divê her û her dengbêjên me çavkanî bin, û hemû gotinên wan divê bêne qeydkirin û terişandin.

Heke em dêna xwe bidin rêça rênesans û modernîteya dinyayê jî her eynî rastî xuya dike: Her tiştê nû li ser kelepora kevin ava dibe. Lê ji ber ku modernîzm wekî gelek tiştan di nava civaka kurd de mîna mirîşka serjêkirî ye û şaş tête fahm kirin, îro bi tenê navê dengbêjan heye.

Heke ev dengbêjên me di destê van ewropiyan de bûna, dê stran metelok çîrok û destanên wan ji xwe re bixistana çem û robar û tê de bi şev û roj soberberî bikirana, dê her gotineke dengbêjan ji xwe re bixistana vîtamînên A,B,C û rojê sê danan bixwarana heta bi ser xwe ve bihatana. Lê welatê me mixabin di nava şikefteke tarî de ye.

## "ÇEPÊN TIRKAN ÊN KU JI KANIYA DEWLETA VEŞARTÎ AV VEDIXWIN BI ZIMANDIRÊJIYA XWE VE AQILÊ ENTELÎJENSIYA KURDAN ÇELIQANDINE"

**Tê gotin ku Niştimanperwerî bi edebiyatê dest pê dike. Roman, berhemek pir hêjaye di edebiyatê de. Herwiha, roman barkêşê gotara niştimanperweriyê ye. Edebiyat û romana Kurdî çi tesîrek li doza Kurdayetî kiriye?**

Niştimanperweriya kurdan mixabin ne xurt e, bi destê rewşenbîr û bi kopalê dewleta Tirk her tê manûpilekirin. Nivîskar û rewşenbîrên kurdan di bin nîrê van berovajîkirin û manîpulasyonan de qelema xwe dibin tînin û çend gotinan dibêjin. Bi taybetî çepên tirkan ên ku ji kaniya dewleta veşartî av vedixwin bi zimandirêjiya xwe ve aqilê entelîjensiya kurdan çeliqandine.

Em bi rihetî nikarin bibînin ku şervanekî kurdan bi nav û dengê xwe ve bikeve ser kaxizên edebiyata kurdî. Her kes behsa dîwarên bajarê xwe dike, her kes êşa dayikên xwe vedihûne, her kes çîroka xwe helbesta xwe ji welatê xwe re dike deriyê azadiyê, lê dema ku dor tête ser kurdan ji

www.arsivakurd.org

me re dibe qebahet. Jixwe du sê nimûne hene meriv şerm dike ku bixwîne tu dibêjî qey di berhemên xwe de dixwazin bibêjin ku "Kurd ne niştimanperwer in...!"

**Helbet ev ji bandora van manîpulasyonên ku min jor behs kirî tê.**

Di hinek berheman de jî bi gotinên xav behsa "Kurd û Kurdistanê" tê kirin, helbet ev jî zirarê dide hebûna vehûnandina nivîs û hunerê. Di edebiyatê de meriv dikare bi gelek awayan, bi sembol û sîmgeyên lihevhatî, bi metafor û nihêrînên veşartî ve behsa niştimanperweriya xwe bike. Mesela meriv dikare di berhemekê de çar hezar çavikên cihê veke û di her çavikekê de jî meriv dikare dûmana gundekî şewitî bi cih bike, yanî ez dixwazim bibêjim ku huner rê dide gelek awayan.

**"ROLA ZIMAN BO MILETAN ROLA MAN Û NEMANÊ YE"**

**Di Hişyarbûn û pêşketina netewan de rola ziman çiye?**

Rola ziman bo miletan rola man û nemanê ye! Di roja îro de ziman ji bo hebûna miletan bûye wekî "DÎN"eke modern ku bikaribin hebûna xwe pê biparêzin. Ziman ji bo her miletî bêhn û hebûn, reng û dirûv, ken û girîn, mifte û mala wan e!

Heke mesele milet-azadî-dewletbûn be, ziman ala ye, şûr û mertal e, gule û berik e, tîr û kevan e, alaveke mezin yê xweparastin û berxwedanê ye...

Heke mesele dîn be, meriv dikare taet û îbadetên xwe dia û kelaman bi zimanê xwe xweştir û rihetir bike, yanî ziman bang û zengila meriv e, secade û tizbî ye, cinet û bexçeyê herî mezin e! Ne xerîb e ku dewletê medreseyên kurdistanê girt, îro piraniya nivîskar û dildarên kurdî an ji feqetî û seydatiyê tên an jî dê û bavê wan. Meriv dikare li ser vê yekê gelek xebatên doktorayî bike...

Heke mesele înternasyonalîzm û biratî be, jixwe her kes bi zimanê xwe di nava mala dinyayê de heye û bi rengê zimanê xwe dibe birayê hev...

Heke mesele siyasî û polîtîk be, bi fêrbûna zimanekî meriv dikare bêtir bikeve nav rihê civakekê û tê de qayîşê bikêşîne û bigihîje armancên xwe yên siyasî û polîtîk...

Heke mesele edebiyat û çand û huner be: ziman av û xwîna berhemekê, reng û qîrîna lîstikekê, kanî û bilbilê stranekê ye...

Lê heke mesele tiralî û xwexwapandineke ecêb û bêmane be, jixwe meriv nikare tiştekê ji vê malxirabiyê re bibêje

**Pêwendiya ziman û raman, ziman û edebiyatê çî ye? Berhemên edebî, hewceye li gor zimanên xwe yan li gor kesayetiya nivîskarên xwe werin binav kirin.?**

Pêwendiya ziman bi edebiyat û ramanê re an jî bi celebeke hunerî re weke tevr û bêrê ye, di hûnandin û xepartiya berhemekê de destebirakiya hev dikin. Lê ew çendî nêzî hev bin jî, di karê xwe yê esasî de ji hev dûr in. Ziman weke çemekî di nav rihê civakê de diherike û mîna nefelekê ji nû ve xwe divejîne. Edebiyat û huner jî vegotina rihê wê civakê ye. Filankes an jî bêvankesek dema ku pirtûkekê binivîse heke ku ji rihê zimanê xwe qut bibe dê nikaribe mesela biwêjeke biçûk tê de binivîse, an jî heke bixwaze stranekê bistre çiqas ku dengê wî xweş be jî dê nikaribe peyveke kurdî bilêv bike. Heta agirê ziman geş nebe dê tu carî pêt li berhema hunerî jî nekeve.

Ya rastî berhema nivîskar ji kesayetiya wî/ê girîngtir e! Belkî nivîskarek ji bo nivîsandina berhema xwe -belkî jê re pere lazim e, an jî dixwaze ji bo hûnandina berhema xwe tecrûbe werbigire!- biçe firaxan jî bişû. Dema ku me berhemeke filankesekî/ê xwend divê ji me re nebe derd ka kesayetiya wî/ê çi ye? Lê bivê nevê li rojhilata malneketî berhemek mixabin bi kesayetiya nivîskar ve tê xwendin.

**"BI YA MIN HEBÛNA ALFABE Û ZARAVEYAN NE PIRS Û KÊŞEYEK E!"**

**Pirs û kêşeya yekîtiya elfabe û zaravên di zimanê Kurdî de gelo wê çawa çareser bibe.?**

Bi ya min hebûna alfabe û zaraveyan ne pirs û kêşeyek e! Helbet em dihizirin ku dema yekîtiya alfabe û zaravayên kurdî çêbe, dê ji ber xwe de yekîtiya kurdan pêk were û bi vî awayî dê Kurdistan jî azad bibe, ev rastiyek e. Lê her dem çemê jiyanê wekî xwestek û rîtûelên siyasetê yên rojane naherike. Min ê bigota bila berî her tiştî rewşenbîr û serkêşên civaka me xwe fêrî alfabe û zaravayên din ên kurdî bikin, lê dema ez dibînim hêj ku zaravayên xwe nizanin û hêj ku navê gundê xwe yê bi kurdî nizanin bi zimanê serdestan qala yekîtiya zimanê xwe dikin, ez dibehecim û dimirim...

Ev mesele bêtir dikeve ser hêz û şiyana kurdan ya siyasî û entelektûelî.

Lê helbet heke rojek ji rojên Xwedê li çar parçeyên Kurdistanê jî li gorî rewş û hereketên xwe çar dewletên Kurdistanî yên cihê jî ava bibin, heke her sê zarava jî bi wext re bêtir ji hev dûr kevin û her yekî bibin zimanek û di dibistanên Kurdistanê de her sê ziman(kurmancî, soranî, zazakî...) bi hev re bêne xwendin, bila ti kes ji vê jî netirse û nexe hewlohawar.

**"BI DU SÊ GULAN BIHAR NAYÊ"**

**Xuya ye di edebiyata Kurdî de, helbest zêdetir pêş ketiye. Çima? Helbesta klasîk a Kurdî û ya nûjen bi çi şêweyî divê ji hev werin cuda kirin, yanî çi ferq di navbera wan de heye.?**

Helbesta kurdî ne ku pêşketiye, -bila ti kes li min negire!- bi tenê hejmara helbestan roj bi roj zêde dibe. Helbet bi du sê gulan bihar nayê, lê dema ku em helbesta îro noqî zimanê kurmancî bikin, gelo dê çend jê tê de bibin av û dê çend jê bi ser kevin û hikmê wê ava zimanî bikin. Weke gelek fenomenên din, helbestnivîsîn jî li ba me şaş tê fam kirin. Helbestek divê bikaribe hemû pexşana zimanê xwe di bin çengê xwe de bisitirîne. Helbestnivîsîn ne bi tenê fêrbûna gramer, rêzkirina du sê gotinên sor û eletewş e! Dema behsa xwendina helbestê bête kirin, çima em hê jî bêriya Baba Tahirê Ûryan, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran dikin, bila her kes ji xwe biperse! Ji ber ku helbestek di zimanekî de divê bibe kakilê gûzekê, rihê çivîkekê, şîrê şêrekî û şîva şivanekî...

**Xebata di warê ziman û gramera Kurdî de bese yan na. Hewcehî îro zêdetîr bi çî heye? Gelo mumkune ku di pêşerojê de (rojên pêş de) ferhengek mezin ku ji hemû zarav û devokên kurdî pêk hatiye çê be. Ji bo vî karî hewceye çi were kirin ev wezîfeya girîng hewceye ji aliyê kî ve were pêk anîn. ?**

Wezîfeya pêşîn dikeve ser milê Enstîtoyên Kurdî, Hikûmeta Başûr û Belediyeyên Bakûr. Helbet gelek dereng jî ma, lê kurd dikarin li Amed û Hewlêrê Navendekê ji bo ferheng û wergerê vekin. Îro îmkan û derfetên kurdan têra vê yekê dikin, lê nikarin xwe organîze bikin û tovê pêşeroja xwe bireşînin. Heqê serkêşên kurdan tune ku di nava îktidara xwe ya rojane de pêşeroja zarokên vî welatî bidin ber sersariya xwe. Welatek miletek bi kitêbxane, ferheng û pêşketina çand û hunera xwe ve di nava aqilê dinyayê de tê pîvandin, ne ku bi slogan, qîrewîr û bejn û bala xwe ve...

Civakek bêyî pirtûkxaneyeke mezin, bêyî her çeşît ferhengên qerase, bêyî wergerandina pirtûkên girîng û kilasîk wekî kerr û lal û şehtan e!

## Avabûna Navenda Nivîskarên Kurd

Di daxuyaniyekê de roja 12.11.1385(01.02.2007)'an, Desteya Damezrîner a Navenda Nivîskarên Kurd, avabûna navenda han ragihand.

Li gor daxuyaniyê, Navenda Nivîskarên Kurd di hizrê de ye ku nivîskarên Kurd li cem hev kom bike û xaniyekê avabike ku xebat û û çalakiyên "menewî", karîn û kêrhatîbûna nivîskarên Kurd, hizir û pênivîsa wan ji bo nivîsîna evîndariyê, pêşde bibe.


Her wiha di daxuyaniyê de navê Peyman Yariyan, piştî anîna navê endamê Desteya Damezrîner, weke berpirsê demkî yê navendê hatiye.

E-Mail: **kurd_writers@yahoo.com**

www.arsivakurd.org

# GERDÛNÎBÛNA MIROV

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Em di gerdûneke têkel a ku gelek mezinahî û dorfirehiyên bêserûber di xwe de dihêwirîne de dijîn. Ligel ku mirovahî li gorî zanîn û zanebûna xwe hin tevlîheviyên dinê dadihûrîne û pêşve diçe jî, gelek tiştên têkel ên ku hêj nehatine veçirandin û çareserkirin hene. Belê dîsa jî divê tiştên ku ji hêla mirovahiyê ve hatine dîtin û vedîtin tu car kêm û biçûk neyên dîtin.

Di vê gerdûna bêserûber de mirov wekî misqalê zer tê hesibandin. Belê mirovahî bi hiş û aqilê xwe yê pêşketî bi ser gelek sir û pinan vebûye û gelek tiştên ji xwe mezintir kiriye. Ango mirov bi saya aqilê xwe gihîştiye vê merheleya berz û negihêj. Mirovahî heta beriya niha bi çend sal jî bi baweriya ku roj li hawirdora dinê digere/dizivire, tevdigeriya. Belê piştî nûvedaniya giloverbûna dinê û nasîna pergala rojê, têgihîşt ku dinya û gelek gerstêrkên din li dora rojê dizivirin. Û têgihîşt ku roj jî di nava komstêrkên asîman de tenê wekî stêrkeke birqoq tê hesibandin.

Bêşik, heyînê herî hişmend û aqildar mirov e. Belê ew hişê ku ji bo mirov wekî xelatekê hatiye dayîn, bi du awayan tê bikaranin. Yek, hişê ku bi awayekî erênî û yê din jî hişê ku bi awayekî neyinî tê bikaranîn. Ango mirov her gav aqilê xwe di riya başî û xêrdariyê de bi kar neaniye. Gelek caran aqilê xwe di suxreya bêxêrî û bêkêriyê de bi kar aniye. Bo nimûne; mirov bi saya aqilê xwe, xwe gihandiye radeya herî bilind û payeberz; belê dîsa bi saya aqilê xwe, xwe daxistiye pileya herî serberjêr. Bi saya aqilê xwe, zanîn û teknolojiya îroyîn bi dest xistiye; belê dîsa bi saya aqilê xwe ew zanîn û teknolojî tenê ji bo berjewendiyên xwe yên kesane bi kar aniye. Bi saya aqilê xwe gerdûn û feza nas kiriye; belê dîsa bi saya aqilê xwe parzemînên dinê parçe parçe kiriye û sînorê dijminahiyê li dora xwe gerandiye. Bi saya aqilê xwe jiyaneke aram û têkûz pêk aniye; belê dîsa bi saya aqilê xwe ew jiyan xistiye bin xizmeta ezîtiya xwe. Bi saya aqilê xwe alav û amrazên teknolojiyê pêk aniye; belê dîsa ew alav û amrazên pêşketî, di riya şer û pevçûn û komkujiyên dinê de bi kar aniye. Bi saya aqilê xwe pergal û qanûnên gerdûnî pêk aniye; belê dîsa bi saya aqilê xwe ew pergal di xizmeta berjewendiyên xwe yên desthilatdar de xebitandiye. Bi saya aqilê xwe, xurek û vexurekên dinê afirandiye; belê dîsa bi saya aqilê xwe ew xurek û vexurekên bêsînor ji bo nefsa canê xwe ji ber mirovan manî kiriye.

Divê pêşî rol û rista aqil li ber çavan were girtin ku cudatiya navbera mirov û ruhberên din were fêmkirin. Heke na tu kes nikare behsa berhemdariya mirov û pêwendiyên wî/wê yên gerdûnî bike. Ji lewre beriya aqil, tiştên ku ji nezanî li ser mirov dihatin ferzkirin hebûn. Hê gelek kesên ku ji zanîna gerdûnî bêpar mane û naxwazin rol û hêza aqil bibînin jî hene. Çi ne ev tiştên dereaqil û derezanistî? Gotegot, bawerî û nezanî. Ev her sê tişt jî hem dûrî aqil û hem jî dûrî zanistê ne. Ev her sê tiştên bêbingeh wekî kelem û astengiyên asê li ber hiş û zanîna mirov hatine raçikandin. Mirovahiyê ew her sê astengiyên bêoxir bi saya zanîn û hişmendiya xwe ya pêşketî hin bi hin ji holê rakir û xwe spart aqilê xwe yê ku mû diqelêşe. Îro ro her tişt bi saya aqil û zanînê çareser dibe. Tiştên ku dûrî aqil û zanînê be, her wiha dûrê rastî û çareseriyê ne jî.

Mirov tiştên heyî bi navgîniya sehekiyên xwe dihishisîne. Bi saya van sehekiyan gelek zanîn û daneyên ku bi dest dixe di hişmendiya xwe de vedişêre. Taybetiya mirov a sereke ku wî/wê ji heyîn û heyberên din(ên candar) vediqetîne, hişê wî/wê ye. Tiştê ku mirov ber bi zanebûn, nirxandin, darizandin û behreyên afirîner ve dike hiş û aqilê mirov e. Mirov bi saya aqil xwe ji radeya lewir û ajaltiyê rizgar dike. Aqil, her wekî din jî mirov ji dozîneyên lewrirî bi dûr dixe û wî/wê ber bi lêkolîn û dahûrandinên analîtîk (dahûranî) ve dike. Heke ne wisa bûna, tu cudayetî di navbera mirov heyberên din de nedima û dê mirov jî wekî heyberên din da asta lewirtiyê de bimana. Belê ne wisa ye. Mirovê hişmend û gerdûnî, ji do heta îro ligel aqilê xwe zanîn û behredariya xwe jî pêşve biriye; hest û bestên xwe kemilandiye; rol û rista xwe ya dîrokî lîstiye; di fezaya bêserûber de lêgerîna heyîn û heyberên pêşketîtir kiriye. Belê dîsa divê mirov, aqilê xwe yî afirîner û pêşketî her gav ji bo aramiya mirov û di riya mirovahiyê de biserifîne.

Heta ku mirov alav û amrazên ku bi destê xwe afirandine nexe suxreya aramî, şadî û şadimaniya mirovahiyê. Berî her tiştî divê aqilê mirov bikeve xizmeta mirovahiyê. Heke na, tu fêdeya aqilmendiya mirov jî namîne. Lewre gerdûnîbûna mirov girêdayî hişmendiya mirov a dahûranî û gerdûnî ye.

**Kaniya Helbestan**

## Cimata Keniyan

**Sadiq Eskerî**

Ger rojekê stêrka bextê te
Ji esmanê jîna te were koçber kirin,
Ger rojekê sorgula heza te
Beriya bişkivtinê were per per kirin,
Dil bibe meskenê keserên giran û
Payze şûn warên xweziyên cih nehatî
Renge hingî tu bi min re bibî yar
Ger rojekê tu jî wek min
Bi lehiya hêsrên çavan girê kovanan radey,
Hêviyên dilê te di nava dergoşê da werin kuştin û
Xweziyên te bi guneha mezin bûnê bihên hepsîkirin
Renge hingî tu bi min re bibî yar

Ger rojekê tu jî wek min
Şahidê mirina hêviyên dil bî û
Keniyên te şîniyê ji bo
Nemana xweziyan bigêrin û
Çav bibin gerên şîn û
Dil bibe cimata keniyan
Renge hingî tu bi min re bibî yar
Renge hingî tu min bi tenê nehêlî
Ji bo nemana rondikên çavên min bibî bendav
Ji bo vejyana hêviyên min bibî eger
Ji bo ji dayik bûna xweziyên min bibî çavkanî
Ji bo şahiya dil bibî koşkek mezin
Renge hingî tu ji bo min bibî mexlûqek li cihê xaliq.

## Derdê Evînê

**Serbest Urmiye**

Duh berî sibê
Bi dengê dîk
Hişyar û guhdar bûm
Dipeyvand
Pir bi tan û naz
Sibêde bayê tennazê berê biskan
Reşe bayê deşta Koyê
Ka li te çiye
Te li ber çî tê huşehuş û guregur?
Ma nizanî
Diherimîne li me dildar û bilberên nazik xeyal
Sibêde xevnên evînê?!
Serî hilda dilşikestiyê reşe ba
Hate bersiv
Ji nazke bayê ne dildar ê bilber xapînok
Çiye cem te evîn?
Xwe bipirse carkê ji dil
Ka te kêşaye derdê evînê qe?
Da binalî weke min dem û gavê!
Çûne li ber te dilber û qet dilketî?
Da bizanî dikşînim çî
Min
Huşehuş, ah û fîxan
Di xev de mayê ne dilovan
Ne li êşa ser e
Dîn û dîlê destê evînê
Ya ku tu qet fêm nakî jê
Li benda dil û soza dilberê
Hûnan min sed awaz û stran
Hevdengê bilbila ciger bixwîn
Yên ku ji te re janeser in
Lê
Nezanî ku ya min dilketî
Hezjêkiriya xortê xelkê bû
Çû
Birin tev xwe hiş û aqil
Ne ma li benda min û
Ne awrek bi dil da min
De ka bêje
Ji evînê çi fêm kir te?
Dûr kev ji min
Ne evîndarî tu
Da binalim ez bi êşa xwe

www.arsivakurd.org

# HÛN BI HEVRE XURTIR IN!

Lokman Polat

Partiya Demokrat a Kurdistana Rojhilat, partiya damezrevanê Komara Kurdistanê a Mahabadê ye, partiya serokê nemir Qazî Mihemed, Qasimlo û Şerefkendî ye. Di dîroka siyasî ya kurd û Kurdistanê de ciheke taybetî ya Hizba Demokrat heye.

Ev sî salin ku ez tevgera azadîxwaz ya siyasî ya kurd li her çar parçeyên Kurdistanê dişopînim, Hizba Demokrat heta niha tu tişteke xirab pêk neaniye, tu çalakiyeke nebaş nekiriye û herweha tu dem zirarê nedaye doza netewa kurd. Hizba Demokrat partiyeke modern e û kar û xebata xwe de, di siyaseta xwe de partiyeke serketî ye.

Dema ez pê hesiyam ku Ebdula Hesendade û hinek kadirên partiyê ji partiyê veqetiyane, ez li ber ketim. Nakokiyên nav partiyê û veqetandin partiyê qels dike û tu faydeyeke nade têkoşîna azadiya gel û rizgariya welat, berevajê wê zirarê dide doza netewa kurd.

Di nav van sî salên ku min tevgera siyasî ya kurd şopandiye û ez bi xwe bûme şahidê gelek tiştan û herweha ji nêz ve ji cudabûn û veqetandinên di nav partiyên kurd de bûme xwedî agahdariyan, bi kurtahî tecrûbeyên sî salan dide nîşandan ku gelek caran di nav partiyên kurd de cudabûn û veqetandinên grûpî çê bûne û zirarê dane hêza tevgerên siyasî yên kurd. Veqetandin û parçebûna partî û rêxistinên kurd hêza siyasî û rêxistinî ya kurd zeîf kiriye, xebat sar kiriye, têkoşîn pasîf kiriye, pêşveçûn lawaz kiriye û di her warî de qelsî pêk aniye.



Kes û grûpên ku ji partiyên xwe vediqetin, ji partiya xwe ya berê bihêztir, moderntir û çalaktir partiyekê danamezrînin. Veqetandina wan qelsiya wan e û ew di serî de li siyasetê hinek germ dibin û paşî anku piştê demeke sar dibin, li hemberê bûyeran xemsar dibin û gelek kadirên siyasî ku veqetiyane bi şêweyeke xemsarî xwe dikşînin kuncika xwe û li mala xwe rûnî dikin, têkilê tiştên siyasî nabin yan jî di siyasetê de gelek pasîf dimînin.

Dîroka siyasî ya partî û rêxistinên kurd û Kurdistanê û bi taybetî jî yên kurdên bakur vê rastiya ku min anî zimên bi gelek cureyan û hercar raxistiye ber çavên mirov. Kurd bi hevre xurtir in. Ji hev veqetandin wan bi hêz nake, qels dike.

Di nav partî û rêxistinên siyasî de helbet dê nakokiyên şexsî û pirsgirêkên îdeolojîk, siyasî û rêxistinî hebin. Ya giring ev e ku; mirov bi bêhneke fereh, bi tolerans û bi metoda îqnayê hevûdu serwext bike, bi hev bawer bike û pirsgirêkan çareser bike. Tu pirsgirêkeke ku çareseriya wê tunebe nîn e. mirov bixwaze dikare ji hemû pirsgirêkan re çareserî bibîne û nakokiyên şexsî ji holê rake.

Binêrin, qeslbûn û hêzbûna Hizba Demokrat tenê Kek Mistefa û Ebdula Hesenzade û Hesen Restigar û endamên partiyê eleqeder nake, hemû kurdên welatperwer yên herçar parçeyên Kurdistanê eleqeder dike. Bi qelsbûna Hizba Demokrat tenê hûn naêşin, em jî diêşin anku hemû kurdperwer pê diêşin. Bi qelsbûna Hizba Demokrat dijminê dagirker, olperestên paşverû şad û bextiyar dibin, keyfa wan tê. Di herçar parçeyên Kurdistanê de serketin û pêşketin keyfa hemû kurdperweran tîne, kurdperwer şad dibin, dagirker qehr dibin.

Bawer bikin, dema Xanî Bilûryan ji Hizba Demokrat veqetiya û çû mil da partiya sosyal şoven –Tudeh-ê ez pê êşiyam, gelek aciz bûm. Herweha dema Kek Celîl Gadanî veqetiya dîsa ez aciz bûm, lêbelê dema gotin Kek Celîl Gadanî û hevalên xwe vegeriyane û bi Hizba Demokrat re bûne yek, keyfa min hat û ya tev kurdperweran hat.

Lê mixabin carek din girûpa Celîl Gadanî û Hesen Restgar ku sala 1988’an ji PDK Îranê veqetiyan û bi xurtî dijberiya Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî jî dikirin, piştî vegeriyana xwe di sala 1996’an vê care rihet nerûniştin û Ebdula Hesenzade jî bi xwe re birin û me dît ku wan roja 06.12.2006’an cudabûna xwe ji PDK Îranê îlan kirin. Bi vî karê xwe, wan careke din derdek giran ji xebata siyasî û neteweyî ya azadîxwazên Kurdistana Rojhilat bi serkêşiya PDK Îranê xistin û dilê dijminên Kurd ji xebatkarên Kurd xweş û şad kirin.

**Ji bo bersîvdana Xaçepirsa hejmaran (Sudoku)yê, tenê van sê xalên jêrîn berçav bigirin:**

**1. Hejmarên 1-9’ê di xet(xêz) û stûna serjêr de tenê carekê dubare dibe.**
**2. Hejmarên 1-9’ê di xet(xêz) û stûna çeprast de tenê carekê dubare dibe.**
**3. Hejmarên 1-9’ê di nava çargoşeke 3×3 de tenê carekê dubare dibe.**

## Xaçepirsa Hejmaran (Sudoku)

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | | 8 | 3 | | 5 | 4 | 9 | |
| | 3 | | 1 | | 9 | 5 | | |
| 5 | | | | | 4 | 1 | | 6 |
| 8 | 7 | | 2 | | | 9 | | 3 |
| | | | | 5 | | 6 | | 7 |
| 1 | 6 | 3 | | | | 2 | 8 | 5 |
| 3 | 8 | 2 | 5 | 4 | 1 | | | 9 |
| 9 | | | | | 2 | | 5 | 1 |
| | | 1 | 9 | 7 | 8 | 3 | 2 | |

## Bersiva Sudoku a Hejmara 55’an

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 1 | 9 | 2 | 4 | 3 | 5 | 6 | 8 |
| 8 | 2 | 4 | 7 | 6 | 5 | 9 | 1 | 3 |
| 5 | 6 | 3 | 8 | 1 | 9 | 4 | 7 | 2 |
| 1 | 4 | 2 | 9 | 3 | 6 | 7 | 8 | 5 |
| 3 | 8 | 5 | 4 | 2 | 7 | 1 | 9 | 6 |
| 6 | 9 | 7 | 5 | 8 | 1 | 2 | 3 | 4 |
| 2 | 3 | 6 | 1 | 9 | 4 | 8 | 5 | 7 |
| 4 | 5 | 1 | 6 | 7 | 8 | 3 | 2 | 9 |
| 9 | 7 | 8 | 3 | 5 | 2 | 6 | 4 | 1 |

www.arsivakurd.org

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/kurmanci. php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com




## Lehenga Çîroka Nivîskarê Navdar Yê Çekî "Jaromir Stetina" Keçek Kurd E



Dr. Yekta û "Jaromir Stetina"

Pirtûka nivîskarê navdar yê Çekî, "Jaromir Stetina"bi navê "Stoleti Zazraku"(sedsala mucizeyan) derket. Di çîrokê de êş û perîşaniya sedsala 20'an bi îroyî wek mucîzeyên sedsalê tê bi nav kirin.

Yek ji lehenga çîrokeke Stetinayî jî keçek Kurd a Başûr e. Yavçik aşvan e û di bin çiyayê Rost de dijî. Çîrok zilm û zordariya Sedam Husên ya ser Kurdan bi mînakan tîne ber çavê xwendevanan. Navê çîroka li ser keça Kurd, "Pênc car pênc tiliyên Yavçika aşvan" e. Di dawiya çîrokê de Yavçik ji aliyê eskerên Sedam ve tê revandin û esker li Hewlêrê dest davêjinê.

Nivîskar "Stetina" di heman demê de rojnamevanek naskirî û Senator e jî. Senator "Jaromir Stetina" di salên 90'ê de li Turkiyê hat girtin û 6 sal ceza xwar. Piştî 6 mehan ew teslîmê Komara Çekê kirin ku cezaya xwe li vir bikişîne, lê bê guman hate berdan. Senator "Stetina" yek ji senatorên herî navdar yê welatê Çekê ye û ew dehan sal in ku di kêleka me de kar û xebatê ji bo gelê Kurd dike.

Li gora agahiyan, ev pirtûk di demeke ne dirêj de ji aliyê Radyoya Dengê Ewropaya Azad, Radyoya Amerîka û Radyoya Îraqa Azad dê bi zimanê Kurdî were wergerandinê.

**Dr. Yekta Uzunoglu**

## Rêjîma Sûriyê Dîsa Behsa Kurdên Bênifûs Dike



Di civîna Komîteya Navendî ya Partiya Bees a desthilatdar li Suriyê de, careke din li ser pirsa Kurdên bênifus hate rawestandin. Serokê Sûriyê di civîna han de behsa vê kêşeyê kiriye û gotiye ku "ji bo peydakirina çareseriyekê ji bo dayina nasnameyan ji bo biraderên li Hisiçayê lêkolîn têne kirin".

Li gorî çavkaniyên malpera "Suria News"ê, serokê Suriyê gotiye: "Tiştê ku ji me re derdikeve, ji wan [Kurdan] re jî derdikeve; û tiştê ku ji me tê xwestin, ji wan jî tê xwestin." Bi vê gotinê ew dibêje ku Kurd û Erebên li Suriyê xwedî heman maf in. Li Suriyê Kurd têne çewisandin û mafên wan ên neteweyî û yên mirovan têne binpêkirin. Ew di destûra Sûriyê de wekî neteweya duyem li Suriyê nayên pejirandin.

Berî niha rêjîma Suriyê gelek caran soz daye ku nasnameyên sûrî li Kurdên "biyanî" vegerînin, lê sozên xwe bi cî neanîne.
Di 05.10.1962ê de, hikûmeta Sûriyê di çend seetan de nasnameya sûrî ji bêtirî 120 hezar Kurdên nişteciyên bajarên li parêzgeha Hisiçayê li Kurdistana Suriyê kişand û ew bê maf û wekî mirovên "biyanî" hiştin. Li gorî agahiyên rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî, hejmara Kurdên bênifûs îroj digihê bêtirî 250 hezarî.

## Evîndarên Valdaroyê; 5000 Sal In Di Himbêza Hev De Ne



Li herêma Valdaroya Îtalyayê de di erkolanek arkeolojîk de; du îskeletên di himêza hev de hatin dîtin. Li gor agahiyên arkeologan yek ji îskeletan yê mêrekê ye û ya dinê jî yê jinekê ye û 5000 salî ne. Arkeologan navê êvîndarên Valdaroyê li wan kirin.
Seroka grûba arkeologan; "Elena Menotti" ragihand ku, herdu jî bi tîrê hatine kuştin.
Tê ragihandin ku dibe ew jin û mêr zanibûne ku dê werin kuştin.

**PUKmedia**

Berpirsên Leşkerî Yên Amerîkayê:

## Îran Di Îraqê De Bombeyan Didanê

Li gorî nûçeyên Radyoya "Farda"yê, roja yekşem, 11'ê Şibata 2007'an, berpirsiyarên Leşkerî yên Amerîkî li Îraqê de, di civîneke de bi nûçegihanan re, pirtik û kerên mayî yên hin bombeyan nîşan dan ku tê gotin Îranê ew dayîne terorîstan.

Yek ji rayedarên bilind yên hevalbendan ji nûçegihanan re got ku ev bombeyên "EFP" ku li ser rê û cadeyan tên dayîn û dikarin nava otombêlan jî biteqînin, bi dizî ve ji rêya Îranê bo Îraqê haitne anînê. Çend ker û pirtik ji van bombeyan ji nûçegihanan re hatin nîşandanê. Jêderên han gotin, tenê Îran e ku di herêmê de dikare bombeyên wiha çê bike.

Arteşa Amerîkayê dibêje ku ev alev li Îranê tên çêkirin û bi fermana rayedarên herî bilind yên Komara Îslamî ya Îranê ji Îraqê re tên şandin.

Berpirsiyarên Amerîkî û Înglîsî gelek caran Îran bi piştevaniya malî û leşkerî ji girûpên terorîstî û radîkal ên Şîî tawanbar kirine.




www.arsivakurd.org